

# TIRÊJ

## KOVARA ÇANDE Û PIŞEYÎ

Hejmar: 2 Sal: 1980

**ÇANDE/Ş.BIŞAR**

Xwendîna Bî Zmanê Kurdi/S.ARDA

**ZWANE QISSE KERDIŞI Û NUŞTIŞI/P.ZERTENG**

Jî Rojen BARNAS (Helbest)

Bî Avê Bî Nan

Bibîk Dirêsin

Nîzanîm Kengê

Helbestên **MALMÎSANIJ** (Zazakî)

“Etnîk”

Kitabê Ramîtey

**DIZ** (Çirok) / M.Eli

Serpêhatîya Bûrjûwazîyê Pîçûk (Helbest) M.Ronga

Helbestên **BERKEN BEREH**

**ÇEND BERMAYEN MÎTOLOJÎK**/M.Qasim

Jî **O.DARA** Sê helbest

Ê Ma Wo (Zazakî-helbest) Farûq

**ZARGOTIN** (Kurmancî, Zazakî)



# TİRÛJ

Hejmar : 2  
Sal : 1980

KOVARA ÇANDE Û PIŞEYÎ

têxistini

● Raberi ... ..	3
● Çande / S. BIŞAR ... ..	5
● Xwendîna Bî Zmanê Kurdi / Serxas ARDA ... ..	8
● Zîwanê Qise Kerdîşi û Nuştîşi / Pankîsar ZERTENG ... ..	10
● HELBEST	
Bî Avê Bî Nan / R. Barnas ... ..	13
Bîbîk Dirêsin / R. Barnas ... ..	15
Nîzanîm Kengê / R. Barnas ... ..	17
● De Were Bînvîsîne (Serbûri) / Flit TOTANÎ ... ..	19
● HELBEST	
«Etnik» / Malmîsanîj ... ..	27
Kitabê Ramîtey / Malmîsanîj ... ..	29
● Engîstê Kejê (Çîrok) / M. BIRÎNDAR ... ..	32
● HELBEST	
Serpêhatiya Bûrjûwaziyê Pîçûk / M. Ronga ... ..	37
Çarin / M. Ronga ... ..	39
● Dîz (Çîrok) / M. ELÎ ... ..	41
● Jî Berken BEREH	
Mîna Guleki Eveli	
Ger Bîbuhure Jîna Me (Helbest) ... ..	50
Jî Ba Me Rê Dîçe Xweşitiyê (Helbest) ... ..	52
● Çend Bermayên Mitolojîk / Mihemed Qasim ... ..	53
● Jî O. DARA:	
Îro Disa (Helbest) ... ..	56
Ev Leşkerê Rom (Helbest) ... ..	56
Wer (Helbest) ... ..	56
● Ê Ma Wo (Helbest) / Farûq ... ..	57
● Bîmûsnê (Helbest) Mehmed ... ..	57
● ZARGOTIN	
Dilok (Zeri) ... ..	58
Dilok (Çîng û çîng) ... ..	59
Xal û Warza (Estanek) / Arêkerdox: Farûq ... ..	60
Çîbenokê Zazakî / Arêkerdox: Dewîj ... ..	63
● Eskerê Boyik An Baqek Jî Kulîkên Çiyayên Bakûr / K. Şengal ... ..	65
● Ferhengok ... ..	67

Sahibi : Enver YÜZEN / Mesul Müdür : Ahmet Bozgil / İdare Merkezi : 850  
Sok. No : 51/A 3. Beyler Kemeraltı - İZMİR / Dizgi : Evren Matbaası / Baskı :  
Ze Basımevi / Fiyatı 75 TL. Yurtdışı iki katıdır / Basıldığı tarih: 25.3.1980



# RABERİ

Xwendevanên Beréz,

Bı vê hejmara duyem disa em bı we re ne. Hejmara yekem bı şıhibineki dıjwar û bı kefxweşi ji aliyê we ve hat pêrgin kırın, dı demeki gelek kurt de dı nav gelê me de belav bû.

Bê şık me bersivên hın pırsan da û ragıhand. Ku hoyên (şertên) sıyasi, abori û h.w.d rê bıdın, em ê vê peyıtandinê (isbatê) bımeşının.

Me çı bersiv anin:

1 — Her weki dı nav bajarvanıyên piçûk de ji têr nezaniya zman dıhat axaftın, Kurdi bı tenê ne zmanê axaftına rojane, ya mala û qehwa ne. Lê, tevi van zmanê nivisanê, yê çande û pişeyi ye ji.

2 — Bı Kurdi nivisandın ne kareki gelek dıjwar e; bı xwe lê daninê, ser êşan û cadandinê gelek hêsa ye.

3 — Bo afirandına hılberinên çande û pişeyi, Kurdi ne zmaneki teng e, bı eksa vê ditinê têrkır, fereh û balûpal e.

Peyıtandına (isbata) van bersivan ev e ku; tu niviskarek me ji tu filolojiyek Kurdi ne destûryar e. Gışt ji bı alikariya

Wendoxê erjayej,

Ma û şıma na ûmara dıyını dı hewna piyayim. Şıma ûmara verênı bı dıjwarey û bı şayi pêrgin kerdı, demewo gellek kılmdı, gelê ma mıyan dır vıla biy.

Bê şık ma bersivê (cewabê) tay persan dayim û resnayim. Sew şertê mayê sıyasi, abori (ekonomik) û a.b. verdê, ma ni hina weş ispat kenim.

Ma çı bersivi ardim:

1 — Heze kı burjuvaziye werdı mıyan dır-semedê zıwan weş nê zanayişi ra-vajêno, Kırdki Zıwanê qıssey kerdişê keyan û qehwan nı yo. La nıyan reydi zıwanê nuştışı, zıwanê çande û pişeyi yo zi.

2 — Kırdki nuştış, karêki gellek dıjwar nıyo, eleqedar bıyayış û sero vındertış gellek asan o.

3 — Qandê vıraştışê hılberıyanê çande û pişeyi, Kırdki xwı ra zıwano teng nıyo, zıwanêk herr û hera o.

İspatê niy bersivan no yo kı; nıwiskaranê ma ra çewwek yow filolojiyê Kırdki ra desturyar nıyo. Heme zi sayedê transformasyonê zıwanzanayişbê yewna

transformasyonâ zmanzaniyâ xwe i der zmanek dinê û bî lê cadandina makezmanê xwe vi kari pêk tinin. Bê şik wê siberoj qadroyên pêûsgir yê xurtir derkevin, bî pêşketin wê qadroya niha li rê bihêlin. Ev ji dermijara pêşveçûna çande û pişeya Kurdi de wê bibe fereca xêrê.

Li ser me, li ser zmanê me, li ser şêla me; li malan, li qehwan, li ser lingan axaftin û raberizin (mınaqaşa) bûn, hatin kîrîn. Tirêj bû mijara axaftin û raberizînê. Ev Kêfxweşiyek mezî e ji bo me. Digel axaftinên bî pesindari yê bî lomekari ji hatin kîrîn. Bê şik ev ji tiştê gelek xweş e. Lê xweşiya mezî ew e ku; rexne bî nivisani bîn kîrîn û ji Tirêjê re bîn ragihandin. Ev rexne; çî erîni (musbet), çî neyîni (menfi) dîbin bla bibîni, dilê wi zane. A gîring, bî nivisani ragihandin e. Em vê hêviyê ji we dîkin. Lewra her bêje û hevokên rexneyên bî nivisani, wê bibe kevîrê avahiya ava bûyîna çande û pişeya gelê me, ya Kurdi. Avahiya çande û pişeya Kurdi ya nû; bî kevîrên van rexneyên nivisani wê ava be. Bî vana wê hindava xwe sererast ke.

Der vê mijarê de; ji kerema xwe re, me bê hêvi me hêlin.

Bî selav û gîramên me.

TIRÊJ

zîwani û zîwanê mara y xwî sero xebetiyayîşi, ma ni kari anim ca. Bê guman meştî qadroyê nuştokê hina xurti vejîyênê. Qadroyê newey ku nîkayêna xwî ra pey verdê.

No bare y over şiyayîşê çande û pişeyê (sîn'et) Kirdki di ku ver bî xeyr bo.

Ma sero, zîwandê ma sero; keyan dîr qehwan dîr, lingan sero-pay ra qîssey û mınaqêşey biy. Tirêji, biy bare y qîssey kerdîşi û mınaqêşa. Na, ma ri zerweşeya gîrd a. Wesif dayîşi hetî vatey lomekarey zi vajiyay. Bê şik no zi çiydo gellek weş o. La weşşeya xîşni na ya kî; rexney, bî nuştîş bibê û Tirêji ri bî erşawê. No rexne, biyaye beno nêbiyaye beno o zano, gîringi a ya kî bî nuştîş bî erşawê, ma resê. Ma, şîma ra na hêvi kenim. Çimka heryew qîssa û cumla rexneyanê nuştan bena siya awaneya awan biyayîşê çande û pişeyê gelê ma, ey Kirdki. Awaneya çande û pişeya Kirdki ya newa bî siyanê niy rexneyanê nuştan awan bena. Bî niyan ku dormare y xwî sererast bîko.

No bare dîr; keremdê xwî ra, ma bê hêvi me verdînê.

Bî silam û gîramî.

TIRÊJ

# ÇANDE

## Ş. BIŞAR

Bı kurtayi em dıkarın bêjın ko hemi tıştên bo domandına jinê tên afirandınê çande ye. Jı bo domandına jinê, mirovın, gere dıviyahıyên xwe i bıyolojik û cıvaki pêk binın. Ev dıviyahıyên hanê xwarın, lıxwekırın, bııbûn, malxwedıkırın û her weki dinê ne. Jı ber ko her tışt dı xwezayê de amade ni ne, mirovın dı kevin nav xebateki ajo bêna. Dı pêvajoya vê xebatê de gelek tışta dı guhırının û gelek tışta lı xwezayê zêde dıkın. Ev guhırandın û lézêdekırın ne tenê dı warê darengi (maddi) da, dı warê ramanweri (entellektüel) da ji dıbe. Çêkırına heskê, avakırına xanıya, navginên hılberini (aletên istih-salê) çewa perçeki ji çandeyê bın; din, bir û baweriyên me i derheq dınyayê da û pişe ji wısa perçeki ji çandeyê ne.

Çande du cur e. Çandeya darengi û çandeya gıyani (manewi). Çandeya darengi, navginên hılberini, hêçandınıyên hılberini û tevahıya malhebûnên darengi ye. Çandeya gıyani; hılberıya xebata ramanweri ye. İlm, pişe, din, raman û pejnên me dıkevın nava çandeya gıyani.

Ev her ducurên çandeyê ji hevûdinê ne qutkırı ne. Dı navbera wan de tşkılı û grêdanek xurt he ye. Dı tşkılıyên navbera her du curên çandeyê da, bingeh, herûher çandeya darengi ye. Burjuwazi û xulamên wiyên pênûsgır dıxwazın bı çandeyê, çandeya gıyani binın zman, aliyê darengi, yê ko bingehê, veşêrın. Lê, gava mirov lı jına cıvaki dınihêre tê xuya kırın ko hılberiyên gıyani, ne ji dervayi jına

darengi, ne ji dervayi pêşveçûna cıvakê ne. Mirovın dı pêvajoya hılberini da dı navbera xwe de hın têkılıyên ji dervayi vên û daxwazên xwe datinin. Evan têkılıyên hanê —têkılıyên hılberini— ne ji dervayi mahora pêşveçûna hêzên hılberini ne. Hêzên hılberini çı qas xurt û lı hember xwezayê serketi bın, têkılıyên hılberini ji ew qas pêşde dıçın. Tevahiya têkılıyên hılberini; bo jina cıvaki, avahiya himi ye. Lı ser vê avahiya himi, seravahiya sıyasi û hıqûqi bılind dibe Ûherweki Marks gelek xweş dıde zanin «teşeyê hılberina jina darengi, pêvajoya jina cıvaki a sıyasi û bı gelemperi a ramanweri dı hoyine». (1) Lê, seravahi pijakek tehati (Pasif) ni ne. Lı hember avahiya hımi bédeng û bêbızav namine. Xwegeriki izafi nişan dıde, û akamên wê ji lı ser bingeh çêdibe. Ji bingeh ra dibe qalík, wê dıparêze û zelal dıke. Ji ber vê yekê gava çandeya darengi dıguhıre, çandeya gıyani ji bı xwe re dıguhırine.

Çande xuyanıyek/(fenomen) dıroki ye. Ji dervayi dırokê, ji dervayi cıvakê tu çande ni ne. Her çande dı demeki dıroki de, ji bal cıvakeki ve hatiye afirandınê. Her çande bı teşeyên cıvak-abori ve gırêdayıye. Heta niha mirovayeti pênc teşeyên cıvak-aboriyê nas kırıye; komunala hovi, koledari, feodali, sermayedari û hevpişki (sosyalizm). Bı van teşeyên cıvak-abori re ji, pênc teşeyê çandeyi nas kırıye; çandeya komunala hovi, a koledari a feodali a sermayedari û a hevpişki.

Teşeyên cıvak-aboriyê dı nav pêşveçûna dırokê de, bı ser û ber lı pey hev tên. Teşeya nû dı nav teşeya kevn de zil dıde, dıgıhiye û bı neyinandına teşeya kevn cıyê wê dıgire. Teşeya nû hın tıştên nû diafirine hın tıştan ji ji teşeya kevn distine. Jêmayiya teşeya kevn bı careki inkar na ke; lı bejıngê dıxe, dıbijêre, tıştên bıker bê-en ko ne lı hember pêşveçûna wê be— dıgre, dı nav xwe da dıbişêve. İro gava em, lı çandeyên gelên dınyayê dınihêrin; leqayi jêmayiya hezar salan dıbin.

Dı cıvakê bı çın (sınıf) da cigirtına teşeya nû û pêşveçûyi, bı têkoşına çınên pêşverû lı hember teşeya kevn gengaz e. Çına serdest çandeya xwe dadimezrine. Lê, lı hember çandeya çına serdest, çınên bındest ji çandeya xwe diafirinin; Ji ber ko dı cıvakên bı çın de, daxwaz û menfeetên her çınê cıhê cıhê ne. Ev cıhê bın xwe dı afirinên çandeyi de, nemaze dı afirinên çandeya gıyani de xwe nişan dıdın. Bo vê yekê dı cıvakê bı çın de, çande ji çini ye. Weki ko Marks û Engels dı «İdeolojiya Alman» de dıbêjin, «ramanên serdest yên her heymanê, ramanên çına dı heymanê de serdest in. (2) Dı cıvakê da navginên hılberini dı dest ki de bın, kijan çın dı warê darengi de



serdest be, dı warê ramanweri da ji ew serdest e. Çinên bîndest heta ne bîn xwediyê navgînên hîlberini. na bîn xwediyê çandeya darengî; lê, dîkarin çandeki gıyani bîafirinî Ev çandeya hanê daxwaz û menfeetên çina bîndest tîne zman, pêşverû û demokratîk e. Dîjîtîya navbera çina, xwe, dı warê çandeyî da ji nişan dîde Bo vê yekê dı cıvakê bî çin de, çandeyek lıxwerû, bo hemî kes û çinan hevpar tu ne.

Pîştî evan gotinên jorî em dîkarin bêjîn ko têde û têvexwarîya çandeyê dı nav pêvajoya pêşdeçûna dîrokê de dıguhîre û çini ye.

Hejmara pêşîya me, emê lı ser çandeya neteweyî bisekînin.

---

(1) **Ekonomî Politiğın Eleştirisine Katkı (K. Marx - Sol yay.)**

(2) **Alman İdeolojisi (K. Marx - F. Engels - Sol Yayınları)**

# Xwendîna Bî Zmanê Kurdi

Serxas ARDA

Pirtûk, kovar û rojnamên bî zmanê Kurdi; ne bî dom kîrîn bin ji, jî 1963 vê de pîrr-hîndîk tîn weşandin. Jê, tu yek jî li erdê na mine, gîşt tîn firotin. Yê ku jî aliyê karbidestên ferma ve tîn berhev kîrîn ne tê de.

Ez gelek rast lê hatîme, nas an hevalên min jî van weşinekan kîrîne, kêfxweşîya xwe dîyar kîrîne, weşinekê kîrîne berîka xwe, rîya malê girtîne û çûne. Çend roj şûnda —ku dibêjim ne sê-çar roj, sih-çil roj— min jî wan bî çavzêlki pîrsîye: «Gelo te ew pirtûkê —an kovar û rojnamê— çawa dîtî, rexneyên te çî ne?» An xwestîne jî bersivandîne birevîn, an jî bersivên wek «pîrr xweş bû, pîrr baş bû, lê min ne xwend.» dane. Disa min pîrsîye: «Bo çî, çîma te ne xwend?» Îcar bî vi awayî pîrsa min bersivandîne: «Lo camêr gelek gîran nîvîsandîne. Dîvê rewşa me jî bîdana ber çavê xwe, parîki sîvîktîr bînîvîsandîna» an jî «lo heyra tu zani ku Kurmancî pîrr gîran e, ne wek Tîrkî ye. Ez dîkarîm rojname an pirtûkek Tîrkî seranser bîxwinîm, lê hema ku dest bî xwendîna Kurmancî dîkîm, êş dîgire serê min.»

Ez rast lê hatîme, lê nî zanîm we jî bersivê wîlo bîhistîne, an jî hun jî rastî rewşên wîha hatîne?...

Bî hêsani xwendîna zmanekî, hî nî hêman û hoyan dîvê. Îro, xwendekarekî xwendegêha destpêkî nî kare jî rojnameyan, «Cumhuriyet», «Milliyet» an yekî wek vana, bê artîlin bî hêsani bîxweyne. Pakopîso bîxweyne jî, lê ne gotar (makale) û nîvîsanên wan î ramani û sîyasî...

Îro em, dî warê Tîrkî de jî zanîngêh (nîversîte) û jî xwendegêhên bîlînd destûryar bin jî, dî warê zmanê Kurdi de, bî pîrrani û gelemperî hê dî gehîneka çîna (sînîf) sêyem an çarem ya xwendegêha destpêkî de ne.

Lı Tırkiyé, tu xwendegehek bı zmanê me hindekari bıke, tu ne. Dı xwendın û nıvisandınê de jı Tırki bı transformasyonu, dı bıkar-aninê de ji, em hevcedar ın jı «ZANİNGEHA DÊ Û BAV» û jı dorhêla xwe bıhewısın, hewısına xwe xurt û qelew kın.

Gelek xwendevan wê bı bir binın ku gava meriv pirtûkek sıyasi, abori an h.w.d bı Tırki dıxweyne tevi ku meriv bı wi zmani çend xwendegeh qedandıye ji, disa ji bo hewcedariya seri lê danê, dı bın destê xwe de çend ferheng peyda dıke.

Em çawa kın, ferhengên çap kırı û têkır yê zmanê me lı Tırkiyé tu ne ne. Em hewcedar ın; bı xwe, bı xwedanê lê bıgerın, bıhewısın.

Gıranıya nıvisareke ji çend sedeman dibın:

1. Jı gıranıya mıjara (mewzû) nıvisarê,
2. Jı lê ve ne bûyına xwendına wi zmani,
3. Jı bêjeyên bıyani an yên nû-bıhisti,
4. Jı bê serûberi an xwaroviçko bûna hevoksazi.

Dı kovar an rojnameki de ne gengaz e, gışti nıvisaran jı bê serûberiya hevoksaziyê gıran bın, tê ne yên gıhiştın. Tê de çend nıvisarên sıvık ku meriv tégıhije hımın wê hebın. Bı xwendına van nıvisarên sıvık, hêdi hêdi meriv wê zerekiya xwe ya xwendını pêşve bıbe.

Gelek xwendevanên bı hındiki destûryarên xwendegeha bılınd wê bı bir binın ku; VEKÎTa (imla) Tırki, ya İngılızi, ya Alemani û ya Fransızı jı hev têvel têvel ın. Her weki wan, vekita Kurdi jı jı ya Tırki têvel e. Lewra Kurdi zmaneki tewangi ye, Tırki pêveki ye. Bı çavê ûsul û qaidên vekita Tırki ku meriv lı nıvisarên Kurmanci bınhêre, wê ser ne keve an ji dereng ser keve.

Bêjezaniya me gıştan qels e. Çend kesên dı bêjezaniya Kurdi de xurt bên xuyani ji, wek şaşên dı nêv koran de bın. Ew ji dı himberên xwe de bı kılûkêmasi ne, lê ne wek yê dın.

Çare çı ye?...

Çare qıjılandına dı donê xwe de ye. Her kes dı hındava xwe de bı rêdana gengazi û keysa xwe bı hedan û bı rıköyi, bo dewlemend kırına bêjezani û bı frêqeti xwendına xwe, bıxebite, bıxweyne. İro, rıya séyem mıxabın tu ne.

Dı hejmara 27 ê Hawarê ya 15 Nisan 1941 de Mir Celadet Bedır-xan ewa dıgot: «Kuro eyb e, şerm e, fehıt e. An hini zmanê xwe bıbın an mebêjin em Kurd ın. Bê zman Kurditi jı we re ne tu rûmet e, jı me re rûreşike gıran e.»

Ma ne we ye? Ma zmanê Mele Mihemed Eli, İsmet Efendi û Felemezê şofêr-yên dı çiroka Flit Totani ku dı hejmara yekem de derket ji zman e?... «Na weleh...»

# Zıwanê Qisse Kerdîşi û Nuştîşi

Pankisar ZERTENG

Zıwan, verê verkan yew wasıtayê fahm kerdîşi û fahm bıyayîşi yo. Merdîmi, pey bı zıwani heme çiy fahm kenê û danê fahm kerdîş. Xebat û lebat, dayîş û gırewtîş, musayîş (bander bıyayîş) û musnayîş (bander kerdîş), zanayîş û zaneyîş sayedê zıwani yeno ca. Yew netewi (milletı) mıyan dır heme qorê merdîman pey yew zıwani qıssey kenê. Qorê bîndesti û qorê serdesti cıya cıya zıwanan reydi qıssey nê kenê. Hetana kî sazuman (düzen, rejim) zi bedelêno labrê zıwan leza lez bincaren nê bedelêno. Bedelıyayîşê zıwani verra verra wo. La qandê bedelıyayîşê zıwani ri gani gellek zeman véro. Hergu komel û cematê merdîman wayirê yew zıwandê xwîné cayi yê. Vıyartîşê zemani reyra zıwan zi tedêno, heta qıssana vişi beno, zeydnenê.

Roj yeno kî zıwan bı feki tena nê maneno. Vengi û qıssey zıwani, bı rısman û tipan (herfan) nusênê. Nuştîş, çı bı rısm çı bı tipan reydi beno o zano, kıştı zıwani dı yew gâma over û hera ya. Zıwan, heyana kî nê nusıyawo, durıst nê beno. Destûrê zıwani bıbc nêbo pey bı nuştîşi rast benê, bê nuştîş weş saz nê benê. Rıyê dına dır kotılmey merdîman demew kî aver şiy, ay çaxan zıwanê xwî nusênê. Ow zıwan zi çıqqas bınusıyo hendina weş beno, zeng û zelal beno, zıwanê qisse kerdîşi û zıwanê nuştîşi yew o? Heme çiy ra ver kê ra haseno kî her merdım şiyeno bı zıwanê xwî xeberı bıdo, qıssey bıkerê, labrê her kes nışıyêno zıwanê xwî bınuso nê zi bıwano.

Wendîş û nuştîşê zıwani zav ra tayi xebat û musayîş wazeno. Dor û dermarey ma dır bı hınzaran kesi estê kî zıwanê maray xwî qıssey kenê la nışıyêné bınusê û bıwanê. Heyana kî kes esto dibıstananê berzan, fakultan dır waneno hewna nışıyêno zıwanê xwî bınuso yan zi bıwano. Semedo kî Tırkıya dır ewro zıwanê ma qedexe (yasax) kerdewo, gani ma no rayır dı lej bıkerım. Bêxeyja xwî ma havlı kami ra pawenim?

Zıwan dı yewna mesela bını estâ: Zarava (dıyalekt, lehçe) yê zıwanan. Zıwani mıyandır bı dergeya diroki (tarixi) dır ferqê girdi virazênê. Zıwan, xwı mıyan dı ca ra ca bedelêno, gamı yena kı wayirê yew zıwani ca ca yewbınan fahm nê kenê, yew zıwani mıyan dır çend grubekê zıwani vecênê. Ni grubanê zıwani ra zarava vajêno. Ma vajim zıwanê Kırdan dır: Zaravayê Kırdasi (Kurmanci), Zazaki (Dımili), Sorani, Gorani-Hewramani estê.

Bê zaravayan, hergu zarava mıyan dı fina ferqi estê. Yew zarava mıyan dı zi ciya ciya qıssey benê. Nıyana zi ma şiyenım vajım fek (şive, axız). Ma vajim: Zazaki mıyan dır Fekê Dersimi, Fekê Bingoli, Fekê Sêwregi, Fekê Pirani, Fekê Gêli. Ni fekan ra tay cado hera dır, tayi zi cado teng dır vıla bivê.

Zaravaya Zazaki hına kemi û erey nuseya. Semedê na ra embazi estê kı nuştış û wendış bıney çetın veynenê. Gani ma xwı nê vir kerim kı çıyo asan çınnıko, bê xebat û bê lej teba nê dekuweno destê kesı. Yeweya zarava û yeweya zıwanê Kırdan bıbo nêbo ebi nuştış û wendış yena ca.

Tikê xebat ra pey herkes şiyêno zarava xwı dır nuştış û wendış seri bero. Dima zi zaravayanê binan kê şiyênê bımusê. Ferqê kı yew zarava mıyan dır nê zi beyntarê zaravayan dır estê, gird û zaf nıyê.

Feki û zaravay vere pê ra zaf duri hasenê. La raştıko wını nıya. Kê kı sero bıney vındertê û kê bala xwı day bıder, kê ewnenê kı bınekey qısseyan û vıraştışê cumleyan yewbınan tepışeno nê zi yew o. Ma vajim yew yew ca dır Zazaki dır herunda tip (herf) a «a» dır, tipa «o» vajêna:

<u>Rast</u>	<u>Şaş</u>	<u>Kırdasi (Kurmanci)</u>
zıwan (zan)	zon	zıman
gam	gom	gav
zanayış	zonayış	zanin
manga	monga	mange

Yan zi ma vajim Fekê Dersimi dır hına vişi herrunda tipa «ş» dır tipa «s» yena vatış :

<u>Fekê Dersimi</u>	<u>cay bini</u>	<u>Kırdasi</u>
asmi	aşmi	meh, hiv
so	şo	here
sima	şıma	hun, we

Gani ma zarava û zıwanê xwı binusim, bıwanim, bımusım, bımusım kı zıwanê ma vıraziyo, ca bıgıro, vıla bıbo.

Embazi este kı wazenê zıwanê dewa xwı nê zi zıwanê keydê xwı TÎRÊJ dır bıveynê, bıwanê. Demewo kı zıwanê dewa xwı nê zi keydê xwı kovara ma dır nuşte nê diy kırr bınnenê, tay vanê: «Xelet nusıya wo (yanlış o)», yan zi cadır verdanê, nê wanenê vanê: «Fahm nê beno», «Nö Zazaki (Dımili) nı yo».

Wa kes guney xwıno kemaney xwı şari ser nêno. Herkes gani gunekarey û sujê xwı zi veyno. Betaley û tırraley hını bes a!

Ma verna vat bı kemaney û xeleteyê ma bı nuştış û heşyar kerdişbê şıma wendoxan kemi benê. Hadê gıdı, şıma veyno!...

Pênusı (qelemi) bıgiri, dest pey kerê!...

## HELBEST

### Bı Avê, Bı Nan

Rojen BARNAS

Bı avê  
Bı nan  
Bı seri hıldana Roja mefermend dı serê Sipan  
Û bı karina me  
Ew ê  
Bı zari  
Û bı nemana qıdûm dı çokan  
Seri deynın.  
Jı Dehak  
Jı Çar  
Jı Şah  
Rebentır bın.  
Ma na yê bira wan ku  
Mêran jinên xwe  
Dê weledan  
Davêtın jı xezeba me  
Û revin  
Tu ci û nvin  
Lı wan sitari ne kırın

Bı avê  
Bı nan  
Bı jin bışkifina dı bûtıkên kulilkan  
Femandarê femandaran her em in.  
Bihna me fereh e,  
Lê em ne yên xezebê careki...  
Bla bı bir binın  
Me  
Çıyayê pentagonê  
Mina arvan  
Bı hêran  
Çawa hêra lı Wietnamê,  
Lı İran  
Û me  
Çeka dı dest Hitler çawa kır dijminê serê wi  
Û me çawa hejand Mûsolini  
Mina dêwkula lı sêpiyê  
Lı daran.

Bı avê  
Bı nan  
Bı dilopa xwêdana eniya xebatkêran  
Bê mefer û xemgir me bın  
Nêzik e bıbışkife felati  
Dı gerûya Rojê,  
Bı sarıya asıwayê lı navsera Sipan  
de.



# Bibık Dırêsın

Rojen BARNAS

Bibık,  
Dırêsın  
Dihonın jı herıkinên pejnan.  
Lı dezgê çavan  
Vedıgrın tevne-evini  
Jı mekûkên pêtin û rengin  
Canfesên agirin  
Lı dara dıxın.

Her çı qas  
Dıl  
Bı birin  
    bı kovan  
        û qirin  
            bın  
                ji  
Guherinek xweş dıkeve dınê  
Roj bı mefermendi hela dıbe.  
Roj dıçe ava,  
Jı berê xemgintırın...

Xavıka xewnan balûpal  
Rengintırın jı wan rengên dı Rojê  
Dınyaya jı me vê nas  
    ferehtır

Dirok pel bı pel jîndar,  
Çıkrım e lı ber me  
Û em;  
Geh froke ne lı serê kortalan  
Û geh fermanderê hêzên nependi.  
Xewnê me  
Geh bı iskin  
Geh bı bışirin...  
Şev stranên xwezîyê dirêsın  
Jı berê şirintirin.

Evin,  
Nijad û din  
na nase.  
Reşık,  
gewrık,  
zerık  
û  
sorin

Nin in  
dı ferhenga wê de.

Gışt,  
Wek hev  
Mirovin.

Were disa ez û tu  
Dılan bispêrın dılan  
Jı xwe re pêjdin  
—jı kewarên evinê—

Çekın.  
Û bı bibıkan  
şanan  
bıhonın jı dilê xwe re.

Şanên xwe i hingıvin  
Jı şırıkên stranên gerdenaza  
Bıxemilının.

## Nı Zanim Kengê?..

Nı zanim kengê  
Wê têr pirtûkên mın hebın gelo?...  
Nı zanim kengê,  
Dê bıkarım têr û seretêra xwe  
Bıxweynım wan yek bı yek...  
Bıkarım bıkarım pirtûkek  
An weşaneki ku mın dıvê  
Bê fıkarı jı karwanê kulê  
Jı cın û xeyberıyan  
Nı zanim  
    nı zanim  
        nı zanim  
Nı zanim gelo kengê?...

Nı zanim gelo kengê  
Gava bı pirtûkek bıçım malê  
Navêje ser çavê malıya mın  
Perpûta mırınê,  
Stûyê xwe xwar ne ke lı aliki  
Û bı gazın ne bêje:  
— «Bes e  
    bes e  
        bes e l..

Te êdi çı divê?..  
Bı te na yê dızanım  
Lê  
Bla gunê te  
Bı me bê.»  
Û xilorik gêr ne bın jı karêzên çavan  
Gava lı ser pirtûkan  
Reşmızginan dibihize jı radyoyê  
Ne rehile jı tırsan  
Tırkin bı dilê wê ne keve  
Û soba serşokê ne yê bira wê  
Jı bêgaviyê.

Tu çı dibêji lo !..  
Tu çı dibêji, derew-şanpıyonê demoqrasiyê  
Azahiya pirtûkan lı ku  
Lı ku ye serbestiya weşanan  
Lê ev govenda dıya te ye  
Ku radigine her êvar  
Nûçeyek lı dinyayê:  
«Bı lêgerina hêzên ewlekari  
Lı filan bajari  
Lı bêvan taxi, lı malek  
Weşanên qedexe kırı û yên çepên pırole  
Hatın derdest kırım.  
Hêzên ewlekari,  
Dest danin ser weşanan  
Û xwediyê wan  
Bırın  
... yê»

Nızanım kengê  
Wê têr pirtûkên me hebın gelo  
Em ê têr û seretêra xwe bixweynın  
Bê fikare, bê tırs  
Nı zanım kengê  
Nı zanım gelo kengê?..

## Serbûriyek:

# De Were Bîwîsine...

Flit TOTANÎ

Mîn jî bo vê hejmarê, çirokek gelek xweş û manidar nivisandibû. Pîştî nivisandinê, mîn çend caran xwend, dû re mîn ew deqtilo kir. Lî ba dilê mîn, gelek xweş bûbû. Hingi mîn dixwend yekcar besta mîn lê vedibû, destê mîn jî xwendina wê ve ne diqetiya.

Lî ser hejmara yekem ya Tirêjê hîn rexne dihatin kîrîn. Ev rexne di derxîsûsa giran bûyîna zmên de bûn. Ez di ber xwe de dibîşîrim û mîn jî xwe re digot; «pîştî xwendina vê çirokê êdi wê lî ser zmên, lî Tirêjê rexneyên neyîni (menfi) ne yê nî kîrîn.» Jî ber mîn ê barekî giran —yê rexneyên neyîni (menfi)— bî vê çirokê jî ser milê Tirêjê hîlda, kêf lî mîn dibû berri, ez dîpîrîpîşîm. Qewlî zarûkan ve pirê jî mîn re got gîlîkî: «Ka çiroka xwe, berî weşandina di kovarê de bî çend hevalan bîde xwendin. Ew ê çawa bibînin...»

Bê şîk ez jî nava xwe têr, jî xwe razî bûm. Nivîsana bî zaravayê Kurmancî, bî sîvîkahî û nermî jî zmanê vê çirokê pê ve êdi ne dibû. Ne gengaz (mîmkîn) bû jî... Bî jî xwe razî bûyî nî bî lî hêvîya pesîndayî nê mayî nî, mîn rahîşt çiroka xwe nişani çend hevalan da. Tabî ev heval ne wîsa rastlêhati bûn, jî aliyê mîn ve hatîbûn bîjartî nî: Yek jê jî Hekarê, yek jê jî Dêrîkê, yek jê jî Sîlîvan, yek jê jî Agîrî (Qerekose), yek jê jî Dêrsîmê, yek jê jî Qerejdaxê, yek jê jî Sîrûcê û ye dî nî jî Cîzîra Botan bû.

Bî rastî, lî ba dilê xwe mîn rêkî wîsa bîjartîbû ku rexneyên wan î derxîsûsa zmên ve, wê bîbûna ronahî bo zmanek nîvekar (mîşterek) lî temamê welêt. Mîn ê nivîsara xwe ya nîha û yê nî dî pêş de lî bêjînga

wan i zmên xîsta, da ku bê gazin û lome, nivisara mîn li her kujê we-  
lêt bihata xwendin. Da her kes bigota: «Eferim Flit!... Meriv bi Kur-  
manci welê dinivisine.»

Mîn hevalan vexwend malê. Ji feleka xwe bê xeber, ji nava xwe  
razi, mîxayê çirokê da destê wan. Dî aliki de ji mîn, ji wan re çayeki  
torinî (hakîmî) çêkir, anî li ber wan dani.

Mîn qewitiya xwe li wan kir. Ew ê bi tenê dî ali zmên ve rexneyên  
xwe bipêdandina (tesbit kirina). Weki dî aliyê teknik û çirok-saziye  
bû ku, ew pisporiyek (ixtisasek) arizî dixwest. Bo ku rexneyên xwe  
bi nivisani bipêdinin (tesbit kirin), mîn têra wan kaxiz û pêûs ji anî  
dani ber wan.

Ya girîng (mîhim) ji bi rasti mijara (mewzû) zmên bû. Lewra li  
ser hejmarê yekem, gelek rexne hatibûn guhê mîn an li çem mîn  
hatibûn kirin. Xwendî an nexwendî, serwest bûyî an serwest nebûyî,  
çî bigre gelek camêran dî ali zmên de dabûn ber dasa xwe û pê ve  
dixûn.

Ji van rexnegiran (mineqidan) yek ji leqayî mîn bûbû:

— Êra mandal çî ye?

Ez tê ne gihîştim, mîn jê pirsî:

— Çî mandal?

— Dî Tirêjê de yaz dîke.

— Tîştêk wisa na yê bira mîn. Mendal ne be?

— Na na lo... Mandal, mandal... Yazmiş dîke «ez mandalek çar  
sali me.»

— Xeletiya te heye birako. Na nivisine «ez mandaleki çar sali  
me», «ez mendaleki çar sali me» dinivisine. Tu dêliyayî (şaşî) Rex-  
negirê me xeyidî, li sûfê mîn ket:

— Yahoo! Ez ê ji çavê xwe inan bikim ya ji te?

Mîn nihêrt em ê bi serê hevûdu ne xîn, ji nerma xwe ve rabûm,  
ji wan nêzikan mîn Tirêjeki peyda kir, anî da destê wî:

— Fermo, ka mandal nişani mîn de?

Heval kovarê dî ser hev de welgerand, wê rûpelê vekir, bi xeyd  
kovarê şîşî çavê mîn kir:

— Ha baş binêre!

Mîn rahîşt helbestê ji seri heta bîni du sê car ~~mandal~~ and, na mandal  
tê tu ne bûn. Xeletiyeki çapê ji tê tu ne bû. Mîn ic ~~mandal~~ hîş rûpelê kir  
nav çavê wî:

— Ka baş binêre «mandal e» an «mendal e»?

Baş lê nihêri, dit ku ne «mandal» e, «mendal» e, vêca ziviri:

— Peki mendal çı ye?

Mın bê axaftın rahîşt kovarê jê stend, paja «M» ya pışka ferhen-goka Kurmanci û Tırki vekır, bêjeya duyem nişani wi da. Lê nihê: i û bı dengek êli xwend:

— Mendal iki nokta üstüste çocuk

İcar ez bışırım û mın got ê:

— Eferım, hêdi hêdi hini xwendinê dibi.

Hevalek got e mın. Camêrek çiroka mın i hejmara yekem, «Te vi zmani jı ku derê ani?» yê jı seri ve çend komek (paragraf) xwendiyê, tebi hetani paşiyê ne qedandıye, rahîştıye kovarê lı ser masê xıstıye û lı sûfê hevalan ketıye:

— Ka we dıgot bı Kurmanci ye? Fedi ye, fedi... Tev bı Tırki û Erebi nıvısandıne, ica xelqê dıxapının dibêjın ku Kurdî ye. Em, bızıvırın ser serpehatıya çirokê û komçıvına rexnegırên wê.

Komçıvın yeko yeko rexneyên xwe i derxısüsa bêjeyan bı nıvıسانی lı ser kaxız, pêdandın (tesbit kırın). Raberızına (mınaqaşa) lı ser bêjeyan dest pê kır. Jı bıli mın, heşt heval hebûn jê ditına du kesan jı beş bı hev ne dıçûn. Piveka (kıstas) her kes dı derxısüsa bêjeyan de, bêjeyên devoka wan i pêwari (yörel, lokal) bûn. Kes ne dıxwest jı kurtı xwe dakeve. Her kes bı bêjeya devoka xwe dıgırt û dıgot: «ya Kürdi jêza (orişin) ev e, yêdın an bıyani ne an jı çêbıwar ın (sun'ı ne).

Bêje gelek bûn, bê hejmar... Raberızın pêşiyê jı bêjeya «axaftın»ê dest pê kır. Dı vê mıjarê de hevalê Hekari lı rex mın ci stend û vê bêjeyê parast:

— Axaftın bêjeki tam Kurdî jêza ye. Lı tamamê Çülemêrgê, lı Behdınan, lı nav Kurmancên İranê tê bıkar anin. Bêjeki dırıst û dı cih de ye. Tu bêjeyên dınê, yêdın dı hun devokan de têtın bıkar inan dewsa vê ya na gırıtın.

Hevalê Dêriki bı hêrs êrişê dıbir ser û dıgot:

— Ka ez jı we gıştın dıpirsım, lı mala, lı gundê, lı bajarê kijan hevalên mayi axaftın tê bıkar anin?... Kes nı kare bersıva vê bı erini (mısbeti) bıde. Lı Çülemêrg û Behdınan tê bıkar anin jı me re çı lazım e. Dıvê peyivın bê bıkar anin. Lı tamamê dorhêla Mêrdinê û lı Cıyarbêkrê «peyivın» tê bıkar anin. Pıştı ku Cıyarbêkri jı «peyivın»ê bıkar bıvın ew çax mesele na mine. Ki dıxwaze bla here qehwên ber postexana piçûk lı Cıyarbêkrê, an jı here qehwa lı serıya Gara Sirkeciyê lı Stembolê, bla jı xwe re bınihêre ka lı wan deran çı tê bıkar anin.

Ev qehweyên her dû cıyan ji qehwên Dêrikıyan bûn. Hevalê Silivani xwe ra ne girt:

— Ku em bi ya Dêrikıyan bıkın, divê navê Dıyarbekrê ji bıkın Cıyarbekır.

Heval gişt kenin. Hevalê Silivani domand:

— Belê rast e, «peyvın» lı dorhêla Dêrikê (lı hevalê Dêrıkı zıvırı) bınihêre ne Cêrık e, Dêrık e ha! Belê lı dorhêla Dêrikê û ji Dêrikıyan ve tê bıkar anin. Disa dibe ku «axaftın» lı Hekarê û lı dorhêlên wê, bê bıkar anin. Lê ev her dû bêje ji lı temamê welêt ne hatine belav bûyin. Ji ber vê qasê bıkaranına wan ne dırıst e. Divê, dı dewsa vê bêjeyê de ya belav bûyi «xeber dan» bê bıkar anin. Ev bêje ango «xeber dan» lı temamê Dıyarbekrê, Sêrtê, Mûsê, tê bıkar anin. Ji ber vê lazım e, ev bêje bê pejırandın (qebûl kırın).

Hevalê Agırı (Qerekoseyi), gotına wi birı:

— Na xêr, ne lı Mûşê û ne ji lı dorhêla Agırıyê ev her sê bêje na yê n bıkar anin. Lı Mûşê, lı Bingolê, lı Erzerümê, lı Qersê welhasil lı temamê dorhêla Agırı «Qıse Kırın» tê bıkar anin. Ji me ve «axaftın», «peyvın» tıştên xerib in. «Xeber Dan» ji ne dı mana «konuşmak» ê de ye. «Xeber Dan» ewe ku meriv ji hınan re xeberan dıde, qêra bı wan dıke. «Xeber Dan» ew e.

Hevalê Dêrsımı, rexneyên xwe ya der vê xısusê bı vi awayı ani:

— Hun dızanın ji ber Dêrsım deverek çıya û bılınd e û ji ber kapitalizm û kultura romê bı derengi ketıyê, bı qası der û cıyên dınê asimile ne bıye, xwe ji asimilasyonê parastıyê. Ji ber vi, bêjeyên lı Dêrsımê tên bıkar anin; ji alıyê Kurdı jêzayı ve giring in. Divê em vıya ji bir ne kın. Lı Dêrsımê tu kes bı «axaftın»ê, bı «peyvın»ê, bı «qıse kırın»ê nı zane. «Xeber dan» ji dı mana kıfri kırınê de ye. Ez na bêjım ku ev pırs ne rast in, lê ya dırıst «qezi kırın» e. Lı çarmedorê Dêrsımê «qezi kırın» tê bıkar anin, divê Flit ji vê pırsê bıkar bine.

Hevalê Qerejdaxı:

— Na ji vana yek ji ne dırıst e. Ya dırıst «galegal kırın» e. Ez fılan û bêvan nı zanım. Merkeza devoka Dıyarbekrê Qerejdax e. Kani û serekaniya zmanê Kurdı ji Qerejdax e, lazım e «galegal kırın» bê bıkar anin. Û ew qas...

Lı mın zıvırı:

— Flit, dev ji tıştên vırtoqi berde.

Hevalê Sırücü lê zıvırı:



— Oxil... oxil ma te xêr e? Galegal ji qijtina pirekan re tê gotin. Çi ye, ew qas hun li ser vi şorê disekinin. Kurdandiya vê şorê, şor kîrîn e. Ji xwe re herin nav eşirên; berazan, dunan, pijan, gawendiyan... Herin Sîrûcê, herin Sûriyê. Bigerin oxil. Her kes «şor kîrîn»ê diemilîne. (Destê xwe li masê xist, hêrsa xwe ani) Dî nav çar diwaran de rûniştine li şorên Kurmanci dîgerin. Wayê min raberi we kîr, herin ji xwe re bibinin. Şorên zêde ne lazim e.

Ji masê rabû ku here, hevalê Ciziri rakir milê wi:

— Ki ve dîçi, ez beni? Bo çi dînîri? Ka rwînit ez ji biştexlîm. Dû re hevalê Ciziri li me zivîri:

— Ez beni li min fekî. Tu kes nî karî inkar kî ku merkeza edeb, ilm û irfana Kurdi ne Cizirê ye. Kultura Kurdi bî Melayê Cizêri dest pê dikî, heta iro têt. Temamê şair û alimên Kurd bî Kurmanciya Cizirê nivîsandine û dînivîsînin. Zmanê Cizêra Bohtan çî bigrî biye zmanê resmî ye Kurdi. Lazim e Flit dî dewsa vê pîrsê de «stexlî» biemilînit.

Axaftin, axaftinê vedikir, li hev drêj dibû mina werisê şixrê. Dumahik qet lê ne dihat. Bêjeyên ku li serê li hevûdu ne dikirin, gelek bûn. Li sér bêjeya «fîringî» haşer çêbû. Ê ku li ser «bacanê sor» bî temamê hoza xwe disekîni, yê ku li ser «domat» bîryara xwe diyar dikir, yê ku di gotîla ew ê şamîk be... Hela helaki mezin bû. Nî zanîm tovê vê zêzewatê bo çi hat nava me. Gelo ew ji ji bo berhevdanê hat?...

Min êdî dev jê berdabû. Ka dibêjin ya agir berda kayê û xwe da aliyê bayê... Yê min ji çî bigre ketibû delaveki wisa. Kesi guhdariya min ne dikir. Bî rasti kesi guhdariya yê dinê ji ne dikir. Tîqûtenê her kes bêjeya devokê xwe î pêwari pêşniyar dikir û li serê ji ku bîva wê serê xwe ji bîda şkandinê.

Li ser bêjeya mendal ji gelek hat axaftin. Her weki «axaftin»ê der vê xîsûsê de ji gelek pêşniyari dihatin. «Sebi», «gede», «tîfal» «weled» ketibûn dora raberîzî. Lê raberîzîna mezin mijara (mewzû) «zarûk»ê bû. Li ser bilêvkîrî (telafûzê) qiyamet dihat rakirin. Çar ditin hebû li ser vi: zarûk, zarû, zarok, zaro... Kesi nêzikayi bî ditîna hevalê xwe ne dîda, her yek bilêvkîrî an bêjeya devoka xwe ya pêwari diristîr dîdit.

Raberîzîna (mînaqasha) bî teşqele bî saetan ajot. Derengê şevê bû. Temamê bêjeyên bin îşaret kîri ne qediyabûn, lê, ji bê wextiyê heval rabûn. Ên mayîni hîştîni rojeki dinê.

Heval gîştî rabûn çûn. Lê ne bî şêla gava hatîne bûn. Gîştî bî şêla

pîsporê (mitexasis) zmanzaniya Kurdi, pîk û bî qubequb jî mala mîn vedîqetin.

Mîn kaxizên nivisara çiroka xwe berhev kirin, lê mêyîzand, malikê tu xirab ne bi.. Çî bîbinim baş e gelo?.. Çî bigre jî sed bêjeyî binê heftê bêjeyan her hatiye xêz kirin. Ev tê wê maneyê ku ev bêjeyên bîni xêz kiri, gişt dê bihatina rexne kirin. Ronahi jî çavê mîn, qîdûm jî çokên mîn briyan. Mîn kaxizên xwe tof kir, avêt şebakê.

Du roj şûn de hevaleki mîn i nas ,bû mêvanê mîn. Ew jî di tenga xwe de li ser Kurmanci radiwesta, lê digeri. Erebi û Farisîya wi jî ne xirab bû. Tebî wi welê digot, ne ku mîn bî Erebi û Farisî dîzani û li gora zanina xwe, zanina wi yê derxîsûsa van zmanan dîpiva. Di hindava xwe de li ser etimolojîya Kurdi dixebitî.

Êvarê, qedereki dûr û drêj me suhbet kir. Şevhêrka me li, ser alûbalê dinê bû. Hêdi hêdi sermîyanê me her duyan jî qedîya, di binê kisikên me de êdi tîstek ne ma. Wê çaxê mîn rahîşt kaxizên çiroka xwe i navdar ani da destê mêvanê xwe. Bî hêviya rexneyên wi yên derxîsûsa zman ve jê daxwaza xwendinê kir. Heval di mana erê kirini de serê xwe hejand, daxwaziya mîn pejrand.

Heval du rêz xwend û bî bêjeki rastlêhati re biranineki xwe gili kir. Her giliyên biranineki wi çî bigre niv saet dajot. Di du saetan de hê hatîbû nivê rûpela yekem. B'raninê wi malîmirati ew qas pîr dihatin bira wi ku jî bêxtê mîn i reş û jî ê çirokê re, dor ne dihat ser xwendinê. Jî bawîşkan devên me her duyan jî, jî deqê carek çar bihist jî hev ve diçûn, hindik mabû ku biqelîşin.

Hevalê mîn kaxizên çirokê li hev nûrand, dani ser masê. Got e mîn:

— Tu zani, ez gelek bê xew im.

— Wîsa be em razên.

— Şevbaş!

— Şevbaş!

Em her dû jî ketin nav nivînên xwe. Mîn lembê bihart. Mêvanê mîn cixareki vexist. Got e mîn:

— Êra Flit, ew çiroka te bî Zazaki ye an bî Sorani ye?

Ez li hev dêliyam, mîn pîrsî:

— Kijan çirok?

— Ev çiroka ku di destê mîn dabû.

De were safî ke, tu ê çawa safî ki? Ez qehirim:

— Ew çirok bî Ewramani bû.

- Ya?...
- Ez yek car qehirim:
- Belé ya.
- Tu Ewramani jî ku derê hin bûy?
- Ewramani?...
- Belé.
- Gelek hêsa ye
- Çawa???
- Jî lingafonê hin bûm.
- Ya lî ser xêrê be. Pîr baş e, pîr baş...

Serê sibê em rabûn. Mîn xuriniyê hazır kîr. Lî ser xuriniyê me axaft. Dî nav axaftinê de bêjeki derbas bû: «hêçandin»... Mêvanê mîn, pey bêjeya «hêçandin»ê ket, pîrsî:

- «Hêçandin» çî ye?
- Lêker e, ango fiil. Tirkandiya wê «denemek» e.
- Bî kijan zmanî ye?
- Bî Kurdi ye.

Serê xwe dî meqamê neyini de hejand:

- Na na xêr ne Kurdi ye. Ku Kurdi bûya mîn ê pê bîzanîbiwa.
- Na na ev ne Kurdi ye.
- Bê şîk wîsa ye.

Mîn vê gotinê bî tînaz gotibû. Bê şîk ne wîsa bû. Mîn jê pîrsî:

- Te diyê bî Tîrki «denemek» heye, Kurdandiya wî çî ye? Zani gelo?

Serê xwe hîlda, pêlek lî arikan nîhêrt. Bî şêleki pîspori (mîtexasîsî) û zanîstyarî (alimî) fikirî, her dû birhên xwe hîlda, dina xwe lî nîquteki daçîkand:

- Dî Kurdi de du sê pîrs (bêje) tên emilandîn (bîkar anîn). Yek jê jî van; «cêribandin» e, lê ev pîrs ne bî Kurdi ye. Jî Erebi tê. «Cerebe», «carîb», «tecrube» û h.w.d tev jî mesdereki dizên. «Sîhêti Kîrîn» heye, ew jî ne bî Kurdi ye. Hema bihna Erebi bûyinê jê tê.

- Lê bî Kurdîya wê çî ye?
- Welahî dî nav xelqê me de «qûna hev ditîn» tê emilandîn.
- Malneket, ev ne argo ye? ne mustehcen e?

Lî mîn nîhêrî:

- A!... Ew çî bahs e? Xelqê me kijan gotinê biemilîne, em ê jî wê kelîmê û wan kelîmatan biemilînin.

— Baş e, bı serê mın ne ket lê em bêjın ku wisa ye, em ê hevoka «bir çok deneyimlerden geçtik»ê çawa wergerinin Kurdi?

Bı awırek manıdar lı mın nihêri, pêvekır:

— Gelek hêsa... Em dı gelek qûnên hev ditınyan de derbas bın. Dı cıyé xwe de şemırım. Êdi axaftın ber mın ne ket.

Mêvanê mın rabû çû. Ez zıvırım hundır, mın pıyanok û feraqên ser masê da hev, masê malışt. Kaxızên çiroka mın i navdar bı stûxwari lı mın dınihêrin. Mın rahişt kaxezan lı hev tewand kır ber çavika sobayê û da ber pêta kibritê, lê bı vê telqinê:

— Ey çirok! Dı pêvajoya rexneyan de te gelek «..... hev ditınyan derbas kır. Dırok alıkarê te be.

# HÊLBEST

## «Etnik»

### MALMÎSANIJ

Wa guşdaro  
    Wa b'eşnawo  
                    heme kes.  
Çehar qirni y dina,  
    Asmêné hewtina  
    Û Zeus,  
B'eşnawo wa  
    Çıqqas merdım, çıqqas geli,  
    duyeli  
    û proletarya...  
    û proletarya...  
Bıra,  
B'ewni tıra!  
Teyr û tebur,  
    gend û gemar,  
Karm û kêz  
    û linc û lêz  
                    zi bi name ya.

Labrê ez...

bê name wo ez.

Hergu teba, hergu kar bı name wo

Ez bê name.

Vila biy namey

Vietnom û Kamboçya û Angola...ri

Mı ri nê vajey.

Ez kewto erey.

Deme'w kî pêşmergey

«bê nav û nişan» gulan feka yê

Dêrsim dir, Mehabad dir, Dihok dir,

Ez «etnik» o.

«etnik bir grup» —grubêk etnik—

Dîrnayox,

Rîjnayox,

Şeqnayox.

Mêratanê ekrananê televîzyonan dir,

«etnik» kî vanê:

tersenê,

recefênê,

telefênê.

Ze atom, ze hidrojen, ze notron,

weqefênê.

Pawitoxê dina, şîma militanê erjayey,

Xwî vir bıyarinê

û şari vir finê!

Gıdino, merdımê dina!

Xwî vir mekerê,

Şîma,

bê naman rê

gani naman peyda bikerê!..

Namey mı peyhesê

Vengê xwî bikerê berz

û guşdari bikerê!

bê tewî bê lertz.

Gelê Kurdistan

û qorê karkeran

Ez o ez...

# Kıtabê Ramıtey

MALMİSANIJ

Hawar, el aman,  
Gıdi, gıdino!  
No çı kul o, na çı tew a?  
Inca, ayca, dor û dormare brin i.  
Brinê brindaran,  
                                  brindaranê renckêşan,  
  dewıjan, sarıştanijan.  
Cendirman û polısanê zirtebozan  
          dest dır ez brindar o,  
                          tı brindar i,  
                          o, a brindar / ma brindar ım.  
Teba ma dest dır nê mend.  
Wa çeki û aşingazê ma ayca manê  
Çendekı kıtabê erjayey estê şıma zanê  
          heme ha ramıtey.  
Ma bı xwı,  
Bı destanbê xwı,  
Kıtab û kovarê xwı,  
Heme ramıtım,  
          bındê herrı kerdım.  
Kıtaban owca,  
          merdıman inca,  
                          gırewtı tewa xwı.

Qe me vaji, qe me persi  
Caran

ridê ardan dır  
kitab ramiya wo,  
debiyo bindê herri?

Belê brao, belê!  
Merdıman kitabi nuşti,  
Semedê wendişi ri.  
La tiya welatê ma dır  
Kitabê kî erjayey wendişi ri  
ha nımitey,  
ha ramitey.

E ya, rašta ya.  
Kitabi filhanan dır,  
Kitabi beyaran dır, firêzan dır,  
Bexçe û rezan û bostanan dır,  
Hewşanê keyan  
û gewan dır, goman û koman dır,  
Binê quçan,

Kerran û kuçan  
mıyan dır,  
Mıyanê dêsan dır,  
Ca bı ca kuçlanan û soban dır  
adır...  
û kitabî-mıtabî ha mıyan dır.

Ha pırr...  
Pırr kitabî pêro.  
Kitabî Kurdistan dır,  
Tırkiya dır ramênê.  
Wa weşbo (!) bêmradê Ordıyê Tırka,  
delo,  
nêmendewo, nêşermaye,  
erro şıyaye,

Mêtingehkar,  
koleperest  
û koneperest!  
Nımıtış û ramıtışê kitabî qe;  
La sew roji,  
Rojan ra yew roj,  
Heze terkey çinayey



Nê kitabê ramıtey bıçiniy se?  
 Şıma bı na gunekarey û rıssiyayey,  
     bêşermey û şermezarey  
     sekeni, çıkeni?  
 Çı herr û wellı xwı serro keni?  
 Çımbestış û işkence,  
 Zılm û zor, kutış û tada  
 Cop û feleqe û cerayan,  
 Barri û çizziya,  
 Waqi û qorri û qirriya  
 Ceniyan û camêrdan,  
     xortan û şıktan,  
     karkeran û roşenbiran,  
     roj beno pere nê kena.  
 Roj beno pere nê keno  
     «sixi» mıxi «egitim»  
 Zulm û işkence û bêdadi bêtım  
     tım û tım rıjiyawa.  
     Rıjiyêna, rızena ey şıma  
     Ow helesêna, puç bena dawa şıma.  
 La ma?  
 Ewro tı nêşınasê zi  
 —Şar camêrdo—  
 Kes çiyeki xwı vir nê keno.  
 Meştı perde û pêçey tu abeno, erzêno  
 Bı destê paleyan û cıtêran  
     karkeran û gelanê bındestan.  
 Heme kes tuf riyê tu keno.  
 Tuf keno, tuf keno,  
     exxin tuf!...

## Engıştê Kejë

M. BRİNDAR

No dı serri yô ki mı mamostayey kerdini. A zi mı ra ni dı serran dı ders gırewt, xwendekara mı bi. Bı riyy xwı asar rınd nê hesebıyayni. La şabey ca gellek weşbi. Beşna ca bari û derg, porê ca zi hezey namedê xwı kej bı. Tıra vatini Kejë. Kejë, bı werıştış û ronıştış, bı tevger û xebata xwı raste rast yew keyneka Kırdan bi. Heta qıssey kerdışbê xwı şermokın, camêrdan ra remayox û bı edeb û malifet-bi. Vişi sermayışdê xwı ver bı vengbê xwıno nımız qıssey kerdini. Ayo semed ra sew kê weş nê guşdarıtini çiyeki tıra fahm nê biyni.

Cıl û belgê xwı tımo pak tebiştini. Labrê hıná vişi çına y kı pıra gırewtin keyen û erjani bi. Dersdê xwı dır zanaya bi; nıwıştışê cay weş asayni la leza lez nê waneyni, tipê xwı têbına kerdni. Tayi xwendekarê mı biy kı mı hini nıwıştêy inan şınasnayni. Ey Kejë zi aynan ra yew bı.

Yew kemaney Kejë bı. Roji demewo kı ez kıştı ra ders dano, kıştı ra sınıfı mıyan dır geyreno çımê mı ta kewt. Ez ewnıyawo kı çı b'ewnıyo, kı Kejë pey bı destê çepi nusena û destê ca o rast dır hirê engıştê kınari ha şıkte yê. Mı zori reydi xwı tebişt. Xwı pizze dır ez dey ri zaf zaf dejayo. Mı xwı bı xwı ri va: «Keynekeka belengaz û meheyri. Tirê çırê enê engıştê tu enawa biyê?» Senê heyana enka ez bider nê aqılıyawo. Mı pizze dı biy kı ez rojik bıperso la mı rayna ve keyneki wa nê şermaya, heyf a, hatıki xwı ra bıgiro. Ay roj eno.

roj ez Kejê ra hina eleqedar bıyo. Verra verra a zî ez xwî rî zey yew bıray zanaya.

Rojan ra yew roj mı nışıya xwî bı tepeşiyoy, ez aya ra persawo, mı va:

— «Kejê, me cigire, ez tu ra yew çiy pers keno; tı do mı rê rast vaca.» Va:

— «Wabo mamosta, ez rast vana.» Mı destê ca işaret kerd, nawıt û ez sebebê şikiyayışê engiştanê cay tıra persawo. Verê verkan alışkê ca biy çil suri, şermayey la hewina zi dest pey kerd, hêdi hêdi pede şiy û va... Verra verra sureya ridê cazi nımızeya vengê ca zi vini biy. Ez têkil nêbiyo, a va mı guşdarit, a va mı guşdarit. A mı rê biy bı mamosta, ez biybiyo xwendekar. Bı matmendeki mı heyana peyni guşi ronay, semedo kî mı né waştîni bişermaya ow vengê xwî nımız kera nêzi vengê xwî bıbirna ez pıra né ewniyayni. Kejê zi atile né dayni vajiriyayni:

— «Mamosta, ez hima verdikek bıya, yew êrewo teng dı dewı dır ma pey hesiyaym kî cendirmey û qomando yeno erzeno dewda ma ser. Biy qij-wij û hermele. Çendeki camêrdê dewa ma biy ko ro qayme gunay, leman û daran ow kerran û kuçan mıyan dı vini biy, şiy. Tayini xwî dest dı tıfingê xwî, tayini şeşdarb-dabançe, tek û tuki zi kereşkoyê xwî berdi. Bıra tayi biy kî kardi, kalme né zi xencerê bawkalan xwî dır berdini. Keso kî bê çek bo zi né wetanayni vındero. Çımka cendırman o kutini ey ra cay çekan û merdıman persaynê. Maya mın û damêrriya mın keye dır biy. Piy mı zi ma vanim Hêgay Armeniyan ayca dır xelle çinayni. Homay zano mंगा aminaniya Temmûzı biy. De tı çi zani na mengı dı ma hetı çehendı germ beno. A tinca telay vera kelekela amnani dı gawiri seri ser de nêro, paliya terkan a. Merju, kışnı, nehey yani wırdı mırdiy rewna qedıyay, cewi zi ha ha pay ra né mendı bi. Vişaney dewıjan kewtê biy xellan; dest pey kerd bı kışta yew ra çinaynê, kışta bin ra zi sebale kerdnê. Aynanê kî nışıyaynê xwî dest dı sebale bıkerê şimbêli, rebeqey né zi celey vıraştini. Qevdê palanê kî pey bı vaştıri né zi tarrı çinıyay û erzıyay, gani cadı pêser bineyni. Ma sebale y xwî, xwî dest dı kerdni. Çımka key ma dır bêxeyja mı dı cenı biy: Ma mın û damêrriya mın. Ge ge zi ma mıterhı kerdni, paley ardni.

Dewijê kî vejıyay ko, maya mı zi lezi kerd çekalê sewlandê xwî, xwî lingi ra kerdı û kewtı teber şiy kî xeberı bero pêrdê mı ri. Né kî cendirmey daşta ameynê tedır şeşdarbê cı tebiştini. Tikê mend ez û damêrri ma ha zerre diyê kî bawo kewt zerre va:

— «Cenêkî mı firset nê di ez şêro ko, vanê teresbavan zaf nızdiy dewı kerdo. mı va hatıkı mı veyni, semedê aya ra ez ameyo. Ez xwı simzuri dı nımnenno. Wa Kejê zi şêro bani ser, dalde y ezli y ra wa bı ewniyo kâ veyni se kenê?» Piy mı ena va û xwı berdê axuri ra kerd, şı heta simzuri ra. Ez ca dı weriştâ şıya nardıwana darên ro vejiyaya, şıya bani ser. Mı xwı da dalde y ezli. Ez tîkêki vınderta, ewniyaya kî kes nê aseno, ez şıyo war. Mı damêrriya xwı ra va:

— «Atê çew çınniyo!» Va:

— «Mankerî wabo, şo vınde nıka yenê!» Ez fina sıyo, mı pawıt pawıt kes nê asa. Veneka mı amey. Me vaji kî ez xwı dı şıya, busawa. Zaf zeman tayi zeman, ez nişka perrawa xwı ser kî yew çizı deketwa dewı mıyan. Vengê gedan û cenıyan yeno. Heti ra bermı, hetı ra vengê bini. Eke kiştâ deştı dır binê dewı dır cendırman bı wırdi destan tıfingê xwı tepıştı, raşt kerdê ver bı dewı. Tıra naşt zi temafila inan ha vındertaya. Seya tuyeri dır zi yew qumandar û çendina teni şarê dewanê binan pay ra yê. Destê dewıjan heme bestey bı. Tıra pey ez hını nê ewniyawo, ez vazdawo, ez vazdawo dıwar, mı va:

— «Atê, amey b'ew şar pêro hını yo têro şono yeno.» Weşniya marda mı ena hewı lebiyayişi reydi va:

— «Herê keynê, sebeno çıssa xwı guşiya kî, mey war, temaşe bıke, hela veyni heta keydê ma ra yenê ninê? Eke amey ay çaxan bê xeberı bıde pêrdê xwı, nêkî piy tu tebişenê benê dekenê qullıkı.» Bê zerri ez gılana şıyo bani ser. Labrê mı waştini kî ez zi şêra teber hamveranê xwı reyra dewı mıyan ra bıgeyra û nızdi ra temaşe bıkerä.

Bani sero mı diy kî hirê cendırman ha Xal Lezgin kerdo xwı beyntar, sungiya serey tıfingı pey ra bıder şanenê û tam danê, vanê:

— «Yurusene ulan sakalınâ... (De şo lo mı dı erdişa...)

Ay roj ra ver zi mı gellek cendırmey diy bı. Ez tıra tersayni, la ay roj ez hina qırti ra bıya, telefıyaya. Mı va qey mı pizze dır çiy qerefiya. Caran ez hendı nê tersawa. Çı nê tersa... Piy muno kî ez û dayka xwıno damêrri ma tıra weqefıyaynim ey zi tersda cendırma ver ay hing dı simzuri dır xwı binê vaşi û simeri dı nımit bı. Heta bin ra zi ayê ejdihayan ha Xal Lezgin ver pé daynê. Xal Lezgin perpızeyni, té şaneyni, ver pé deyni bê hemdê xwı lezi kerdni. Nişiyayni şêro, çımka serrê cı zaf viyarte bı. Xal Lezgin zi berd seya tyeri. Şutıka xafa Xal Lezginı zey wirroyêni şidênaya ow riy eyo veşate berz kerde bı. O nê tersayni. Bineyna pey tayna cendırmey kuça cêrêni ra vecıyay, va:

— Burada kimse yoktur qomutanım. (Kes tıya çınniyo qumandarê'm.)

Qumandari tay zeman nımızkani ay binan dı qıssey kerd, veng nê ame kî se vano. Yew cendırmi lingê xwı day pêro, sılam da, vazdi reydi şı peyniya temafilı çıwa ra veti, ardı day yewna cendırmi. Qumandari işaret da, cendırman Xal Lezgin eyşt ard, pêro pıro pêser biy ow tira yewi çekkalê Xal Lezgin i. Zerra mı, mı fek ra amey. Ceniyan da xwı çokan ro, lajek beno keyneki bena qeçeki kotılme biy, bineyna duri kevtê Mı diy kî ez ha nardıwanı sero ya, şona dıwar. Nişka linga mı verra diyay ez vengane dır menda tira pey mı xwı nê diy, oxmo kî ez xereqiyaya. Ez ena ewniyawa kî ez ha simzura tari û dermatı dır verrada pêrdê xwı dır a. Ez kî kena bıberma, piy mı cıgrêno vano:

— Heşşı keyna mı çiy nê beno, metersı. Nıka ê şoni, ma tu weş kenim. «Ez hılpena piy mı destê xwı fekdê mı ser nano, nê verdano vengê mı vejiyo. Me vajı kî ez kew ta, destê xwı mı eşto xwı ver ow ni heme hirı engıştê mı şikiyay; damêriyamı ameya ez berda zerre, ez teslimê pêrdê xwı kerda. Gellek zeman ay beyntar dı şı, vengê maya mı ame. Piy mı werışt xwı weşana roşana, sımerê xwı rışna, çengiley mı tepışt ma vejiyaym teber. Ez hıma zi barrena, tewâ destê mı bê hesab zaf bi, nina vatiş kî ez vaja. Mı zana kî cendırmey şı. Damêriya xwı ra mı eşnawıt kî Xal Lezgin pey bı çıwa kuto, xereqiyawo fina zi ey teba nê vato. Qumandari nişiyawo cay dewijan û çekan fahm bıkeroy, fek tira verra dawo, şıyo. Piy mı vatni:

— «Şıma ina Xal Lezgin i ra ewnênê, ey serra lejê Dersımı dı çı diyo, çı nédiyo, o musnayewo.»

Ay roj kî tari bı, şan dı piy mı ez heri wenaya, berda yewna dewı dı yew hekimi nawıta. Hekimi gellek destê mı dı xebetıya, destê mı ehendina zi dejna, best ma ageyraym. Caran ayroj û a şewı mı vir nê şona.»

Kejê pızze ra yew hesıra pillı antı. Mı ay hing dı serey xwı berz kerd, mı va:

— «Kejê tu ri sujo rastikên kami sero yo. Yani şikiyayışê engıştanê tu dı gunekaro rastikên kam o?» Va:

— «Senê?»

Fahm nê kerd bı kî ez se vano. Mı hewına va:

— «Bı zanayışê tu ayo kî sebebê şikiyayışê engıştanê tu bıyo, kam o? Sew tu dest ra bêro tı heqê nê engıştanê xwı kami ra gêna?» Kırr bırna, milê xwı na xwı ver, va:

— «Gunekar û sebebê engiştanê mî ê yê. Ez bîşina se ez heyfê xwîno Xal Lezgin î inan ra gêna...» Rind fahm nê bîynî kî Kejê kami sebeb veynena. Mî Kejê ra va.

— «Guşa xwî mî dare, Keja mî! Gunekarê raştikêni sermîyandar û mêtîngehkar î. Gani tî bîzana kî sermîyandarey û mêtîngehkarey çiya, çî nîya, ay çaxan tî bîşina vera inan lej bîkera.» Qissa mî, mî fek dî bîrnay, va:

— «Tî kapitalizm û somîrgêcîlx ri nê vanê?...»

# HELBEST

## Serpêhatiya Bûrjûvaziyê-Pîçûk

MEM RONGA

çeq çeq çeq  
                    çeq çeq çeq  
rewş  
  hoy  
    zanyari  
      tevgirêdan  
        Çi ne.  
bese galegal û gotin  
                    sekın  
                            mırın e  
karker tu ne  
                    gundi razaye  
şoreş  
  li hêviya  
    me pêşevanan  
                    maye  
mîlek jî pola  
            dîlek xurt  
                    bese  
                            bo vé  
dengê tivingan  
                    dermanê xewê

teq teq teq  
                  teq teq teq  
mın yeki kuşt  
                  bı mêrani  
yeki  
          ku bı me ra ne dihat ji  
                                  lı kêlek  
  dani

lêxın  
          hevalno  
                  lêxın  
qemberek  
          bavêjin vıra  
                          yeki ji  
                                  wıra  
dınayê bı serê wande  
                                  hılweşınun  
alav / agir bireşınun  
          bımırın  
                  weki  
                          mêra


leq leq leq  
                  leq leq leq  
ne bû  
          lı hev ne hat  
icar  
          gel  
          lı pey me  
                  ne hat  
....lê.....lê belê...  
pasifist...  
          oportunist...  
                          revizyonist...  
                                  ...ist ...ist ...ist  
isk  
          isk  
          isk  
na lo ... hewa ye  
                  ev gel ne hêja ye...





## Çarin

bingehê gerdûna ne afirandi  
ne hewa û agir e ne ax û ne av  
yek tîşt heye bê serû bê dawî  
dî guhîrin û qevzan de bîzav

1



2



get

# ÇIROK

## DIZ

M. ELİ

Dı kuça tari û teng re derbas bû û lı ber deriyê xani yê nızmi kerpiç sekini. Qedereki çavê xwe yê hûri şıl, lı ser kuliyên berfê ê jı jorda dıhatın xwarê gerand. Duvra, lingên xwe dı berfa erdê da û dı deriyê nızmi re derbasi hundır bû. Lı hundır ronahiki qels he bû. Agirê lembê ê ricıfoki şewqa xwe bela dıkir û dı diwar de hın xelekên siyê ên lerızoki çê dıkir.

Çavê wi cara ewıl bı kûrê wi ê dı bin mitêla peritandi ya nêzi kuçık de raxisti ket. Dûvre ber bı jına wi de bılınd bû. Çavê wan bı hev ket, Lê debar ne kır, çavê xwe jı ber çavê jına xwe revand. Seri dı ber da, hêdi hêdi ber bı quncıkâ xani ê pari taritır de meşıya, çû lı wir rûnişt. Qaseki dın, bı siya hêdi hêdi ber bı pê de tê, serê xwe xıst nav herdû çogên xwe û çavên zoq i piçıkên berfê ên lı ser pêlava xwe kır. Jına wi, bê deng hat lı nık wi rûnişt. Demeki dırêj, bê deng wılo lı nık hev sekini. Pişt re dengê jına wi ê nızmiç, wek jı kûr de bê, ket guhê wi:

«Gelo disa vala vegeyayı?»

Wek xwe bı xwe bıaxıve, dı ber xwe de bersıva jına xwe da:

«Erê vala. Wek hergav.» Hinek sekini, pişt re disa dest pê kır, wek bıxwaze kula dilê xwe birevine. «Ev çend rojın, sıbê zû jı malê derdıkevım, dibêjim dıbe ku ez keseki xwedi bar bıbinım... Heta êvarê, lı istesona tirênê, lı xeracên makına, lı xana û kuça beredayi dıgerım. Kesên xwedi bar ên tên û dıçın, tu kes jı naxwazın bı me bıkışının. Ki bê, ya barê xwe lı ereba hespa dıke, yan jı lı textsiki sıwar dıbe dıçe. Hela piştı barına vê berfa pır, ez lı wan der û doran jı

çend himalên wek xwe pêştir tu kesi na binim. Dı vê berf û sermayê de karê xelkê tune wê derdê himala bıqşine? Ne hewcê dirêjkırinê ye Wek mın go, heta êvarê em vala dıgerın.»

Demeki peyv jı kesi der ne ket. Pışt re disa jına wi bı dengeki nızım dest bı axaftınê kır.

«Tu bıgeriya, dı bû ku te jı xwe re kare ki dın bıdita. Bıvê nevê kareki lı gora te jı wê hebe.»

«Jı te tirê ku ez na gerım qey? Qey, ez bê seri lı kuça dıgerım?... Elbet ez jı aliki de jı lı kar dıgerım. Lê karê çı, halê çı... Êdi bıye ku bı bertila jı kes nıkare tu kari bı dest xwe xe.» Hê axavtına xwe xelas ne kırıbû. Lê nihêrt çıqa dıçe giri dıkeve çavê wi û qırık lê zıwa dıbe, dıke nake nıkare xwe jı vi hali xelas ke, dengê xwe bıri. Lê hêsrê çava ne girt; nermık nermık hatın xwarê. Jına wi pıştı van gotına tu bersiv lê venegerand, jı nık wi rabû, disa çû lı ciyê xwe ê berê rûnişt. Pıştı çend deqa, lı kêleka lawık ê bıçûk vezeliya û dı xew re çû.

Heta sıbê xew ne ket çavê mêrık. Çavê xwe bal bı agirê lembêyi zelûl ve kırıbû û dıramiya. Carna jı xwe ve dıçû û dıket xeyala. Lê pır ne dima ku xeyalên wi dıçûn dıhatın disa lı ser agirê lembê ê zelûl dısekınin. Zelûlbûna lembê hın xelekên sıyê dı diwar de çekırıbû. Van xelekana, pède wek guliyê darêyi lı ber bayê dıhejiyan û kederek bıyani dıxıstın dilê wi. Diwarên bê deng û sıyên lerızoki, mırinek sar dıxıstın bira wi. Wê gavê, tamamê laşê wi bı tırs dıricıfı... Carna çavê wi ber bı lawıkê dı bin lhêfa peritandı de razayi ve dıbû, pışt re dıqelıbi ser jına wi. Çavên lawık ketıbûn kortê, dı rüyê wi de jı hestû û çermık pêve tu tışt ne mabû. Bı hıstüyê xwe yê zeif û zıravık wek mırov iskeleteki jı mezêl derxıstıbe û danıbe wir.

Tıştê ku bısev dıhat bira wi û lı ser dıramiya, —pıştı ku tu rê ne dıda ber— hê bêtir kulê wi radıkırın û wi bê hal dıxıstın. Mırov dıgo qey şevêkê, bıst sal bı carekê de wi extiyar kırıye.

Bı dengê kuxukek jı kûr de tê lı xwe varqılı. Çavê xwe ber bı paca pıçûk a naylon ve bılınd kır. Lı derva bagerek mezın hebû. Kuliyê berfê ber bı bayê ketıbûn û vırda wırda dıfırıyan. Jı aliki de jı, mısêwa naylon a pacê dıkutan. Ronahiya ku dı naylon re derbas dıbû û dıheriki hundır, dıda xuya kırın ku idi sıbe bûye.

Carekê lê hay bû ku dengê kuxıkê hê dom dıke. Lı ali deng vegeriya. Jınıkê lawık bı ser zık danıbû ser çonga xwe, serê wi bı ser kuçukê ağır ê vala de xwar kırıbû û jı bo kuxık bısekıne, hêdi hêdi lı pıştı wi dıxıst. Lê dıkir ne dıkir, kuxık ne dısekını. Her ku dıçû zêdetır dıbû û pêre jı qırık lı lawıkê dıxetımand. Dı wir de bı cih dıbû û bıhna lawık dıçıkand.

Ji nişka ve çavê wi ên ku zoq i lawik bûbûn ji hev bûn û bî tîrs li hev geriyan... Ew çî bû?... Tîştê ku didit gelo rast bû?... Pêşiyê ne xwest bawer bike Dûvre nihêrt ku raste; xwinek sor û zîrav bî kef û belxema devê lawik re dihat xwarê. Xwin wek taki sor dirêj dibû û dûvre li erdê di nava belxemê bela dibû. Her ku diçû ruyê lawik soro moro dibû, çavê wi ji hev dibûn û qapaxê çava di werimin. Bî dengêki bê umîd û bî nalin di ber xwe de go: «Yarebî, ev çî hal bû hat serê me, ezê çî bikim?... Bî ku de herim?...»

Jinîk ji mabû heyirî. Çavên wê yi mehzûn û bî hêsr ji bî çarkê de guhîribûn, bûbûn mîna çavên pîlîngê har. Herdûkan ji nîzanibûn wê çî bikim. An bî kude biçin. Lê jinîkê debar ne kîr, bî çavê xwe yê sor û şîl li mêrik vegeyîya û bî ser de qiriya.

«Bese, bese êdî ji derdê te... Çîye tu ketiyî wi quncîkî?... Halê lawîkê na bînî?... Çî dîsekîni, li benda mîrîna wi yi, çî?...»

Didit, baş ji didit. Lê dîkarîbû çî bikîra? Bê pere bû, bê çare bû. Bî vê rebenîye xwe ka wê bî ser kê de biçûna, wê ji kê re bigotana çî? Derdê xwe wê ji kê re vekîra? Him kê wê guh bîdanayê? Na... na... tu kesî ji ji halê wi wê fam ne kîra. Bî dengêki wek ji kûr de bê, got:

«Ez dîbinim, dîbinim lê, bî serê xwe ka karîm çî bikim? Qurîşek pere bî mîn re ne maye. Perê mîtêla ku me wi çendî fîrotîni ji ne ma. Ka di hundîr de tîştêki fîrotîne ku hebe em bîfîroşîni ji tuneye. Ne êzing e, ne dan e, xwarîni e disa. Dîxtor û derman ji xwe pereki gelek pîr dîvên. De ka bêje îca ez ê çî bikim?»

Lê guhê jîna wi ne li wi bû:

«Hero duro, têyî dîkevi vi quncîkê-tarî, serê xwe dîxi nav çongên xwe û wer dîfîkîrî. Ka çî dîkeve destê te?... Tu dibê qey wê xwedê her tîştî ji taqê bîbarîne?... Yan tu dibê hema çî dîbe bîra bîbe? Tu li benda mîrîna me yi, dîxwazî em di nav vi mezêlê cemîdî de bîcehîmîni herîni?... Haa?...»

«Ka ez karîm çî bikim? Heydê tu bêje, dîxwazî çî bikim?»

«Çîma ezê bêjîm? Bî vê kevnejiyîya xwe ezê aqîl bîdîm te? Çî dîfîkîrî tu ji xwe re bîfîkîre.»

Ez nîkarîm tu tîştêki ji bîfîkîrîm. Jîxwe ev çendêki ye serê sibê, radîbîm, dîçîm dîgerîm, heta êvara, nivê şeva... Ha vîrda ha wîrda... Lê tu tîşt bî destê mîni nakeve. Loma, van roja ne aqîl di serê mîni de maye, ne ji taqet di canê mîni de. A, niha gund bûna, disa me karîbû li vi alî xwe bavêta hîneka; nasîti, cîranti... dibû ku rêkî ji mer vebûna. Lê bajar?... ne nase, ne doste... Kî bî kê ye? Yekî ku kar pê bê, ne ez kesî nas dîkîm, ne ji qe... Tu deriyê vekîrî na bînim. Dest û ling li mîni hatîni girêdan.»

«De tu na fikiri, ez ji na fikirim. Eman êdi jî derdê vi lawê teyi merezdari. A, jî tere, tu lê binêre, çawa diki, bike...»

«Hela hişê lê, xwedê jê razî...»

Jinîk bî ser de qiriya:

«Çima ezê hişbim? Ez jî ne insan im, ne dê me? qey, ez ê heroj heta êvarê, bê umîd lî benda mırına wi bîm? Êdi ez nîkarim debar bîkîm. Debar û taqet dî mîn de ne ma.»

«De hela bes e lê...»

«Ne bes e, çima wê bes be? Heta ku wê dî vi halî de be, bigre bavê derva, bîra roki zûtîr bîmre çêtîr e.»

Hêrsa wi rabû û ling bî ling zêde bû. Her axaftînek jinîkê wek tirekê dî mêjîyê wi rake; diçûn dî hundirê mêjî de dîçîkiya. Dîlê wi teng dibû. Her ku çû çavê wi tarî bûn, serê wi gêj bû, dîgo qey diwar ber pê de tîn, ha dîkîn bî ser de hilweşîn. Bî çarkê de bê hemdê xwe jî ciyê xwe pekiya. Bî ser jîna xwe de qiriya:

«Bes e!... Bes e dibêjim jî te re!... Ecelê te hatiye, çîye?»

Jinîkê jî xwe ne xwar:

«Erê, ecelê mîn hatiye... na besîm, ezê bêjim. Heta nîka ez sekînim, ez hiş bûm ka çî bî destê mîn ket? Salê mîn dî vi halê xirab de...»

Debar ne kîr, êriş da ser jinîkê. Destê xwe bilînd kîr û heta jê hat kulmek lî jinîkê da. Bilînd kîr disa lê da. Lê jinîkê dengê xwe ne dibîri. Her ku lê dîxîst dîaxaft; her ku lê dîxîst dîqiriya:

«Lî mîn xe, hema heta jî te tê lî mîn xe... Lê tu nîkari êdi dengê mîn dibîri. Heta ku ezê dî vi halî da bîjim, ez bîmrîm çêtîr e. Qene jî te jî û jî lawê te jî xelas dibîm. Lêxe... bîkuje, bîra ez bîmrîm...»

Jî lîxîstînê milê wi betilî, êdi mest bû. Sekîni, bî çavê sorê xwîni lî dora xwe nihêrt. Çavê wi tu tîşt ne didit. Diwarên dora wi wek kelekên ser pêlên avê diçûn dîhatîn. Gêja wi çû, xwe lî ser lingê ne gîrt, wek xîrareki vala çelîbi bîn diwar û wer`ma. Jî xwe çû. Edî, ne kuxîk, ne jî qîrçîra jinîkê... Tu deng ne diçû guhê wi.

Gava bî hişê xwê hat û çavê xwe vekîr, lî derva tari ketibû erdê. Hêdi hêdi jî ciyê xwe rabû. Êşek gîran ketibû serê wi, disa gêja wi çû. Jî bû ku ne keve, pîla xwe da diwar. Hîneki wer sekîni, pişt re nerme serê xwe bilînd kîr û bî çavê vala lî dora xwe nihêrt. Pala xwe jî diwar hîldâ, berê xwe da ber bî paca naylon û meşîya. Bî piştî destê xwe lî naylon xîst, berfa derva jî ser qewîrand. Demeki derva temaşê kîr. Bagera serê sibê sekîni bû. Şev bê deng bû. Lî derva ronahîki jî ronahîya berfê hebû. Lî der û dorê, jî berfa sîpî û dî nav wê de hîm reşê malên wek a wi pêştîr tu tîşt xuya ne dîkîr.

Jı pacê vegeriya, seri dı ber de, xwe bal bı deri de kır. Deri vekır, derket derva û ket kuça teng.

Berf, bistıkek berê sekınıbû. Lê tevi bërfa ku ji sibê de hatıbû, ji çogekê zêdetır berf ketıbû erdê. Bı sekna berfê ba û bager ji sekınıbû. Lê jıber ku dınê sai bú sermaki ışk peyda búbû. Wek cılêtek tûj serçavê wi dıbiri vê sermê. Debar ne kır, şewqa xwe xıst nav çavê xwe û stukıra çakêt bılın kır lı dora hıstüyê xwe pêça. Destê xweyi cemıdı xıst bêrika pantolonâ xwe û meşiya dınav berfa pır de.

Heta çongê dıket berfê û derdiket. Weka ku ne xwaze çavê xweyi şil nişani xwedayê ku dilê wi pê na şewite û duayê wi qebûl na ke bide, serê xwe bı ber xwe de xwar kırıbû. Berfa hışk û cemıdı dı devdelıngê pantolone wiyê qetandi re dıket hundır û wek perçên camê çimê wi dıbiri. Dıgo qey temamê laşê wi dıke bitevize. Lê qet guh ne dıdayê. Dıbe ku haya wi ji jê tunebû. Bırasti hay lı tışteki ji ninbû. Nızanıbû bı ku de dıçe û çıma dıçe ji... Hew hey lêbû ku ji mala xweyi bı rojane nan û ağır ne ketiyê dır dıkeve. Her gavê ku davêt wi ji vê mala wiyi sar, lê a bı sala ye sitara serê wi dıke dır dıxıst.

Mecbûr bû. Dıvê bıçûya. Edi ne dıxwest destvala vegere malê. Dıvê destvala venegeriya, bıvê ne vê tışteki bı destê xwe xısta. Dı dilê xwe de go «şert e, şert e... dıvê ez rêki bıbinım. Lê ji ku, ji ki û çawa?» Dıkir ne dıkir, bersıva van pırsa dı serê wi de çê ne dıbûn. Pırs dıçûn dıhatın disa dı serê wi de çık dıbûn. Lı wir tevlihev dıbûn û bı tu awayi ne dıxwestın derkevin.

Dıramiya: gelo hew ew tenê bú ê ku hatıbû avêtın çala bê umıdiyê? Deriyê umıdê hew lı ser wi tenê hatıbûn qefaltın? Nızanıbû... Lê dıda bira xwe; bı hezaran insan hebûn mına wi. Jı bê kari, bı hezaran mırov, vala dıgerıyan, ji sıba heta êvara lı qehwa rûdınıştın. Hemi reben û belengaz bûn. Lı dora hev dıcıvıyan û behsa halê xwe dıkırin. Lê dıgotın ne dıgotın, derdê wan xelas ne dıbû. Roja dıtır, roja dıtır... her û her dom dıkir. Gelo nıza wê çawa bûya? Vê rewşa xerab, vê belengazıyê, bê kari û bırçı bûni wê heta kingê dom bıkira? Gelo ro hebû ku ev bırçı bûni û belengazi rabûna?... Tu kes, bê kar, bê mal û bê ağır ne mana?... Herkeseki kareki wi û maleki wi hebûna... Zıkê wi û zaroyên wi têr bûna. Nexweşi rabûna, çı derd çêbûna, derman pêre pêre xwe bigıhandayê. Gelo rojek wılo hebû an na? Nızanıbû...

Jı nıfşkê ve bı dengê firênek sert lı xwe varqılı, xeyalê wi hemi revıyan û zû bı zû xwe avêt kêleka rê. Pıstre lı dû xwe vegeriya. Teksiki çend gav jê wırdetır firên kırıbû. Şofêr serê xwe dı pacê re derxıst, çend çêr kır û disa teksıya xwe bı rê xıst. Teksıyê berf û

çamûra ser rê dî ber tekerlekê xwe re pejiqand û çû wînda bû. Hêdi hêdi rabû ser xwe, çamûr û berfa pejiqiye ser jî xwe dawşand û hov hov lî dora xwe nihêrt Mabû heyirî: çî çax gihiştibû nava sûkê?

Disa dest pê kir, dî kêleka rê re meşiya. Lî ser rê jî otomobilên ku carna dîçûn dîhatin pêştir tu tişt nin bû. Ronahiyên dî pacên apartmanên çar pênc qat re derdiket derva, tevli ronahiya lembên kuça dibûn, derva hê ronitir dîkîrin.

Mala xwe, kuçê tari ê ku tê re derbas bûye xist bira xwe. Kaşê ku dîgişt vê rêya han, cuha ser devê rê ya pîsi û qirêjên sûkê tê de dîherîkin xist bira xwe. Ne dîhat heşê wi, ka kingê dî van dera re derbas bûye. A, vaye aniha tîkûtenê xwe lî nava bajêr dîdit. Ne jî dengê firênê bûna, ki zane wê hê çiqas bî vi awayî biçûna.

Nîza wê bî ku de biçûna... Îstesona tîrênê ket bira wi. Wextê hatîna eksprêsa Stembol û Qurtelan bû. Biçûna wir dibû ku çend qurîş bî dest xîsta. Destê xwe xist berika xwe û gavê xwe jîdand. Bî lez dî qozîya pavyonê re berê xwe da kuça jor. Lî ber pavyonê dengê nara, şikandîna tebeq û qedeha û dengê muzîk û reqsê tevlihev dibû, derdiket derva û lî derva bela dibû. Go: gelo nîza lî hundîr çî dîkîn? xwedê zane hîna hundîr pîr gerxme.

Ku germî ket bira wi jî nîşkê ve wek xew têkeve çavê wi, çav lê mielûl bûn. Pêre jî tîrs ket dilê wi. Ev çî bû? Jî Sermê dîkîr bîtevirîziya, çî? Bî tîrsa tevîzandîne gavê xwe hê zûtîr kîr, berê xwe da istesonê.

Gava gihaşt gara tîrênê hê tîrên ne hatîbû. Destê xwe dî hev da, anî ber devê xwe hû kirê û ket hundîrê salonê. Lî ciheki runîştîne gerîya lê tu der vala ne dit. Lî ser bankên ber diwêr, hîn rûniştîbûn, hînan jî poteki an cakête xwe avêti bûn ser xwe, çogên xwe kîşandî bûn zîkê xwe, destê wan dî bin serê wan de razabûn. Cilê hemûyan jî kevn û peritandî bûn, pîrê wan bî pîna bî hev hatîbûn dirûtîn. Çavê wi lî soba komîrê a navça salonê ket. Xwe gihand sobê û destê xwe da serê. Jî zûve temîrî bû lê hê germî dî hesîne wê de mabû. Destê wi bî sobê ve, enîya xwe sipart lûlê û wîlo ma.

Çend deqe şunde dengê fitîka tîrênê bê dengîya şevê çîrand û lî ser bajêr bela bû. Tîrên ketîbû garê; hêdi hêdi hat lî ber salonê sekîni. Derîyê wê vebûn û rêwî pê re pê re jê daketîn xwarê. Hê deqek neçûbû îsteson bî mîrovan tîjî bû. Hîn dadîketîn hîn lê sıwar dibûn, hînan rêwîyên xwe bî rê dîkîrin hîn jî hatî bûn bergîya mîrovên xwe. Yê ku jî tîrênê peya dibûn, hînen wan dîçûn lî dolmîş û tîxsiya sıwar dibûn dîçûn. Hîn jê jî dî cadê re berjêr dibûn û dîherîkin.



Çavê wi li miroveki dinav qelebalixê ket. Du walizê giran di destê wi de bûn û bi hilke hilk dimeşiya. Xwe ber bi mirov kir û jê pirsî:

«Te hîmal divê gelo?»

Mirov sekîni li çavê wi nihêrt, duvra bersiv da:

«De were, were... hilgire, heta texsiyê. ali mîn bike.»

Zû zû destê xwe avêt valiza, yekê hilgirt da ser milê xwe, a din ji xîst dest û bi pey mirov ket. Ciyê texsiya pîr nêz bû. Gelo heta malê wê pê ne kîşanda? Mala wi miheqeq pîr dûr bû. Heta malê hilgirta ki zane wê çiqas pere bistenda?

«Kekê te divê ez heta malê hilgirim.»

«Mal gelek dûr e kuro.» go mirov.

«Bîla dûr be, ez dikarim hilgirim. Hema rê nişani mîn bîde bese.»

«Tu dini çîye? Dî vê serma han de, ka peyati tê çûndin. Him piştî ku texsi he ye, bo çî?»

Dengê xwe birî, bersiv ne da êdi. Xwe bi xwe go: rast e lê, çî derdê mirov he ye dî vê sermayê de heta malê peyati biçê. Wê jî kubî halê mîn zanibe. Him çî jî wire halê mîn. Derdê herkesê jî xwe re.

Gava ghiştin nîk texsiya, mirov du banknot û nivê hesinî xîst kefa destê wi li texsiyê sıwar bû û çû. Gava mirov pere dirêj kiribûyê destê wan bi hev bûbû. Çî desteki wi yi nermîk û germ hebû. Germa destê wi gihastibû pere ji. Pere dî nava kefa destê xwe guvaşt wek bixwaze germa pere derbasi destê xwe bike.

Heta ku vegeriya hat salonê tîrên bi rêketibû ji. Bi çûndina tîrênê re li garê kesek ji ne mabû. Ew jî vegeriya bê dilê xwe kete kuçekê. Nîza çîma, elektrîkê kuça temiribûn. Hew ronahiya berfê mabû li kuça. Hinekî li kuça geriya. Hema kijan kuçe bi ber keta berê xwe dida wê kuçê. Pîr hindîk nîza çîqa çû, çark ê nihêrt ku li ber camiki ye. Camiki nav mehela bû. Dî deriyê hewşê re ket hundir, çû li ber mûslîxê avê rûnişt. Nîza gelo wê çî bikira? Gelo biçûna malê? Ka qey mal jî vir çêtir bû? Qene li vir dengê giri û kuxîkê ne dîhatê. Bi nerme li dorê xwe nihêrt, çavê xwe di hundirê hewşê de gerand. Ji nîfşê ve çavê wi hat li ser tabûta camiyê a ser berfê sekîni. Çîrûskê agir jî çavê wi firî. Rîcî fîndînek sar laşê wi girt, pişt re mal ket bira wi. Jîna wi, zaroyê wi... niha li malê jî sermana diricîfin.

Xwe bi xwe go:

«Ezê vê tabût ê bigrim bîvîm malê. Wê çend rojeki me germ bike. Qene avek germ wê dî qirîka me re biherike.»

Sekîni, tîrsek ket dilê wi; camî mala xwedê bû. Rabe bîdîze û musibetek bi serê wi de were... Jî camiyê tîşt dizîn gunekî gelek mezin bû. Lê ne be? Kîzane heta sibê dibe ku lawê wi bîmre. Sibê nemîra wê dusîba bîmîra. De çî dibû bîra bîvîna, wê bîbîra. Lê dî dilê

xwe de go: «Ezê aniha bîvîm, lê havînê ezê tabûtek jî vê çêtir binîm bîxîm cih. Ahd be ku bîvê nevê ezê binîm.»

Hê wer dîgo, jî durve, jî minareki dengê azana sîbê bîlînd bû. Xuya bû ku bergiya sîbê bû. Bîstîkek dîn wê ronahi dî erdê ketana: Û a xîrabtîr, wextî mîezînê vê camiyê jî bîhata. Bî vê fikrê zû zû rabû ser xwe û nêzi tabût ê bû. Rakîr tabûta vala, da ser milê xwe û zû zû berê xwe da deriyê hewşê. Bî gavê sîvîk gîhaşt derî. Çaxa ku gava xwe jî derî avêt derva, dengê î gelek lî nêz go:

«Ihî... ihî...» Hema dî ci de sar bû û dî navbera derî de çîk ma, sekîni. Xwêdanek sar dî eniya wirê avêt û dîlop dîlop hat xwarê.

«Hoo... tu ki yi?... Wê tabûtê bî kude dîbî?»

Serê xwe vejerand, lî mîrov nîhêrt: mîezînê camiyê bû. Gelo bîgota çî? Devê wi lî hev gerîya:

«La... lawîk ne... nexweşe... îh, îhh mî go... lawîkê mîn nexweş bû, mîr. Hatîme tabûtê bîvîm.»

«Başe, bo çî vê şeya han, dî vê sîetê de? Û bê haya kesî...»

«Ez hatîm kes lî van dera tune bû, mîn jî bî serê xwe rakîr jî mecbûrî. Ka mînê jî kê re bîgotana?»

«Derewa meke, tu hatîyi dîziyê.»

«Na Wellah, rast dîbêjm.»

«Bes derewa bîke, mel'ûnê mel'ûn. Tu fedi na ki hatîyi dîziya camiyê.» Dengê mîrov sert bû hînek jî dîqîriya. Bêçare, lî ber gerîya.

«Waad be ku na... êê... gotîna mîn ewe ku ez mecbûr mam. Tu çara mîn nîn bû.»

Mîrov, guh ne dayê, qîriya:

«Gîdi mehelîno, zû bîghên dîz vaye, dîz ketîye camiyê.»

Lî ber gerîya:

«Na, na... ez ne dîzîm.»

Lê tu tîşt ne xîst serî. Tabûtê dani. Jî revê pêştîr tu rê ne mabû. Yan na, meheli wê nîha hemû lî ser serê wi kôm bûna. Dest bî revê kîr. Mîrov da pey. Jî alîki de jî lî dû wi dîqîriya:

«Gîdi, cîranno zû werîn, dîz vaye. Zû kîn, gîdi zû kîn dîreve.»

Jî nîfşkê ve tîşteki sert lî paçîka hustîyê wi ket. Pêre pêre, ser serî noqî nava berfê bû.

«Ehey mel'ûn, dî ser de dîrevî jî.» go dengêki. Ev deng ne dengê berê bû/

Derbek dîn lê ket, yek dîn jî... lî ser hev lê dîketîn. Rabû xwest bîreve. Lê bî derbek dîn disa dî nav berfê de dîrêj bû.

«Lêxîm ha lêxîm, bîra ne revel!»

«Lî vî şeytani xîn!»

«Lı vi bēnamûsi xın!»

«Wey şeytan wey, ka tabût ji tê dızın!...»

Qirin û hela hela her ku diçû zêde dibû, pêre ji derb pır dibûn.

Lê dız jı zû ve hemû tışt jı bir ve kırıbû ji. Ne hay lı derba hebû, ne ji qırqır û hela hela. Dar û derbên ku lê diketın êdi qet wi ne diêşandın. Bı dev û poz ve ketıbû nava berfê. Xwinek sorr û zırav jı cênika wi diheriki û dılop dılop dımıquti nav berfa sıpi...

Gava dinê roni bû, lı serê kuçê, dı nav berfa sıpi de jı xwina sori cemıdı û jı dudı-niveki hesni pêştır tu tışt xuya ne dıkr.

## HELBEST

# Mina guleki êveli ger b1 buhire jina me

BERKEN BEREH

Rojek,  
ji ber xeman, kulan  
hinê helbest nivisandinê bûn tiliyê min.  
Niha  
Ji bo evinê  
    ji bo tuneziyê  
û çavên dayika xwe i belek dînvîsim.

Dîbinim,  
zarûk bêpar in  
    —dî salan zarûkan de li dînê—  
    ji xwendin  
    leystik  
    û wêzhevîyê

Dînerim,  
li berbajarka, li kolana  
mina çivika dayika xwe hindakiri  
dîçin û tîn meriv  
    dikevin çayxana  
    çayxanê bê hilberî

Lê divê  
mina guleki êveli  
ger bı buhire jina me

bı şev bı roj  
em evinek bıhonın  
evinek nû û mestır...

Lew  
niha stran me dibêjın  
stran lı çiya.

# Jı ba me rê dıçe xweşitîyê

BERKEN BEREH

Dıkujın lı serê kolanan  
sebi dıminın sêwi  
jın junebi  
û dıl tiji xem

Dihêln çeçiltazi  
birçi dihêln  
bê dibistan  
bê rê  
bê xêni

Û dıminın bı serê xwe  
bı serê-xwe  
mina kulilkên ne kedi...

mezın dibın xem û kul  
stran dibın lawij  
û dıminın  
mina bızmarek lı diwar kutandi  
lı xurbetê

disa ji  
bı me re xweş e jın  
cejn  
geşt...  
evin bı me re xweş e  
û ji xweşitîyê re  
ji ba me rê dıçe.

# Çend Bermayên Mitolojik

Mihemed QASIM

Xatîya me ya Sarê hebû. Wexteki em gundiye hev bûn. Xatîya Sarê hem jinebi bû û hem ji gelek pir bû. Gelek gotinên xweş û kevnare, yên ku hê riyê tavê ne ditibûn, di binê kısıké wê de hebûn. Car carna ku gazın ji bextê xwe dıkir, dıgot:

— Ji me j'tirê me lega reş ne kuşt, tira reş ne kır, aşûjna zebûnıyan ne dızı... ev çı bextê bı reş e ku dı me gerıya.

Tabi mana dızına aşûjnê û kırına tira reş hebû. Lê kuştına lega reş çı bû? Çıma ne lega dın.

Xweş tê bira mın, mın dı newala gundê me de rojek jûji (jıjo) ki girtıbû. Bı kêf û şahı mın ew ani malê, bı çı kul û hali. Bı bavê xwe ve zeliqım mina mozeqirtikê, jı bona ku serjê ke. Mın bavê xwe razi dıkir, dıya mın dı me de derket, şeqameki lı belegoşka mın xıst û pê re:

— Belqıtıyê belqıtı!.. Mın jı te xêrê ne dıtıyo! Tu dıçı jûji dıgırı ha..

Lı bavê mın zıvırı:

— Sed wadê Xwedê lı canê mın bışkên, gava tu jûji serjê ki, ya dı vê malê de bımine ne ez ım. Ew zarok e, fêm na ke, ma tu jı fêm na ki ku jûji seyid e? Tu dıxwazi malê lı serê me xopan ki?

Belê seyideki nû lı gundê me zêde bûbû. Seyid Ebasê Sêrti û Seyid Cezayirê Serhedi hebûn heta niha lı gundê me, û zarokên wan. Lê seyidek nû derket, seyid jûji... Mın dotıra rojê jı seydayê xwe i dersa Camiyê pırsi, wi jı jı mın re seyıdıya jûji got lê, sedemê wi ne got. Jı tırsa ez jı zêde bı ser ve ne çım.

Ev pırs zemanek dır û drêj dı méjıyê mın de bı tevdani ma. Jûji çıma seyid bû?

Wek vana çend tıstên xerib jı hebûn. Marê reş zıyaret bû. Heta kalê mın, ango bavê bavê mın, jı ber rojek lı pesarê marek reş kuştıbû, jı aliyê xeyberıyan ve hatıbû hıngaftın. Pira mın, tım jı mın re dıgot: «Nebi nebi tu tékılı marên reş bıbi. Kalê te sê roj dı pey kuştına mar de, bê êş û nexweşın ket û mır» Ahmedê cıranê me, rojek kúsiyek

girt û ani malê, dû re gazi Silêmanê Hevêdi kır, gotê: «Silêmano, xalê te jî Hevêda hatiye wa yê lî mala me ye. Hun ne lî malê bûn, mîn ew lî mala me ezimand.» Em jî bî Silêman re çûn. Silêman çû menzela mêvana kesi ne dit. Jî Ahmed pîrsi «ka xalê mîn?» Ahmed jî binê dolabê kûsiyê ku lî pesarê girtîbû derxist, nişan dayê. Tev bî hev re kenin.

Çendeki berê çûbûm aliyê çiyê. Lî deştê dor û dorê milka jî şelan qelawûz datînin da ku milk jî hev diyar bîn. Ev qelawûz qelawûzên tixûbên (hîdûd) milka ne. Lî çiyê jî wîsa qelawûz hene. Qelawûzên lî çiyê ne jî şelan, lê jî kevîran in. Tîştekek dinê bala mîn lî xwe kişand. Jî van qelawûzan tenê ne lî dor û dorên milkan, lê dî nav rezan de jî hebûn. Mîn jî hevrayê xwe i çiyayî pîrsi:

— Ev qelawûzên dî nav rezan de, bo çî hatîne çekîrîn? Kevîrên zêde yê nav rezan in, dane hev an jî qelawûz in?

Hevrayê mîn got:

— Cê ew ne qelawûz in bavîko.

Mîn icar bî dest û tîliya nişan dayê.

Got:

— Erê, erê... Ew cê ne qelawûz e. Cê ew dêdwan e.

— Hela hela... dêdwan çî jî teva ye?

— Dêdwan, dêdwan e. Cê çiya, xeyberî, dîz û xîrab jê ditîrsîn. Cê na bîni dî qama sîrnotê mîrovan de hatiye çekîrîn. Cê qelawûz qasî çokê tunê.

Mîn mesela dêdwan, jî gundîyên ku lî wî gundî mêvan bûm, pîrsi. Dî nav her rezi de dêdwanek hebû. Jî dûrî ve dirûvê tîndîrûsê merîvan pê dîket. Merîvên xîrab, xeyberî (wek cîn û perîyan), çiya jê ditîrsîn. Metelokek wê jî hebû; çiya lî çiya dîkîr gazi, digotê: Ho çiyayo! Ma tu nî kari wî rezê lî qûntara xwe ser û binê hev kî? Ew qas jî xwe razîyî, pesnê xwe didî, tu nî kari bî rezekî? Çiyayê lê hatiye bang kîrîn bersivê dîda çiyayê bang kîrî: Bî Xwedanê şev û rojan ez dîkarîm dî weşekî de ser û binê hev kîm, lê fîkara mîn jî wê dêdwana dî nav de ye. Ne jî dêdwana dî nav de bîwa, ser û binê hev kîrîn karê weşek kurt bû.



Mîn çend bermayên mitolojîk —ku bî bawerî û gumana mîn mitolojîk in— dî nav pergala çîrokî de raberî we kîr. Ev û gelek tîştên mîna van hene ku hun rast lê hatîne. Dî nav xwendayan de jî vana re «bawerîyên vala an jî itîqadên batîl» tînen gotî. Tabî mijara (mewzûya) me ne ev e ku, ka ev bawerîyên vala ne, an bawerîyên



rastın. Pêşbira (meqseda) mın ev e ku, gelo ev baweri ji bingehêki mitolojik dîzên an na.

Ku em ji seri de pê ve biçin:

- Kuştina lega reş,
- Seyîdiya jûji (jjo)
- Ziyaret bûna marê reş,
- Xal û xwarzatiya kûsi û Hevêdiyan (Hevêdan li Diyarbekrê, li navçeya Qulpê eşireki ye.)
- Rez parastina dêdwan,

û gelek tiştên wek vana ku di nav geli de hene. Hın ji vana dibe qedexeyi an pirozahiya xwe, di nêzik de di pey bûyereki de standibin. Lê yên din, bi pîrani û gelemperi ji mêj ve hene û li her deri belav bûne, di nav Kurdan de.

Ez di vana de rehek mitolojik dibinim an ji bermayeyiya dema totemizmê.

Vê pîrsa ha tê bira mın: Ma gelo na be ku têkiliya vi kûsiyê, bi ew qewmê ku bi navên Kûs/Kûş/Kûşi dihatin binavkirin re hebe. Di pirtûkên diroka Kurdan de ji vê qewmê tê behs kirin ku, li dorhêla Behdînan ciwari bûbûn.

Her weki ku em tev pê dîzanin, hê ji Dicle û Fîrat di nav gelê me de çemên pîroz tîn zanin. Pirozahiya van çeman di dinê Îslami de ji heye: Tê rîwayet kirin ku di çûyina miracê de Mihemed pêxember, di bihuştê de leqayi xaniki dibe. Di her rîknê vi xaniyê de çemek dizê. Pêxember ji Cebrail dipirse, ev çi çem in. Cebrail bersivê didê ku; yek jê Nil e, yek jê Dicle ye, yek jê Fîrat e, yê din ji Seyxûn û Ceyxûn e. Pirozahiki xwedeyi li ser Dicle di mitolojiya Yewmani de ji heye. Xwede Dianysos di de ser dîkertiya xwe Alpheisiboia, nympa Asyayi. Alpheisiboia xwe bi destê Dionysos ve ber na de û ji berê direve. Tîn ber çemeki. Dianysos dikeve tîmtîla pîlîngek. Alpheisiboia bo ji çem derbas be, dikeve nav penc û hembêza pîlîng ku ev pîlîng Dianysos e. Ji hembêz bûnê bi zarû (hemle) dimine û jê Medos çêdibe. Medos navê xwe li Medan, pîlîng ji navê xwe li çem daniye ku Yewnani û ewropayi ji Dicleyê re TIGRIS dibêjin. Tigris bi yewnani pîlîng e.

Bermayeyên mitolojik berhev kirin karekî pîspori (ixtisasi) ye. Mitoloji ne dirok e, ne wesiqe ne bo dirokek. Lê tê de hın ronahi û çîrûskên têkiliya navbera çandeyan (kültür), yên hêza xeyal kirina afirandinê ya gelê hene. Nîma (sembol) yên mitolojik; xwedi kîroxê pişe û çande ne. Li ba dilê mın, divê ji aliki ve em van bermayeyên xwe i mitolojik berhev kî heta roja wi tê, di gihije destên pîsporen xwe.

# HELBETS

O .DARA

## iro disa

iro disa  
bı destên vala  
bı awırên melûl  
geh bı jêr de,  
geh bı jor de  
meşim dı ber sinor re...

## ev leşkerê rom

neqeba me  
çarikeke bı meşê.  
ez bêm: «leê...»  
wê deng bê  
te...  
...lê ev têl,  
ev mayin,  
ev leşkerê rom  
ne dihêlın ban bıkim,  
ne ji dihêlın bêm...

## wer

...û bînêr  
mal raza,  
bajar raza,  
hîdût raza,  
kul û kedera  
ez nexistim xew,  
hin ko hiv derneketiye  
wer,  
wer cana mın, wer...

## Ê MA WO

## FARÛQ/GÊL

Hêvi hêvi  
Zewncê gay,  
yew heri reydi.  
Bîndê goştê to dî  
Tîrba bawkala  
Kîştâ bîni dî,  
Teylo teluyin  
Sero lewha,  
Lewha sero:  
«Shell sahasıdır girilmez»  
Ana nîştô.  
Tîrba bawkala,  
verêna weyra dî bi.  
Hêvi hêvi  
Zewncê gay,  
yew heri reydi,  
ni yo.  
Hêvi, teylo telûyin wekerdiş o, vîztiş o,  
lewha sero:  
Ê ma wo  
nîştîş şênayîş to.

## BIMUSNÊ

## MEHMED/SİNEG-ÇÊRMÛG

Memusnê tîfîng û herbi  
Wa bîmusê serbestey û  
rîndi  
Bîmusnê A, bîmusnê B  
ey  
Wa bîmusê B'ey  
dîma C'ey.

# Zargotın (folklor)

## DİLOK

(1)	Hey zeri, zeri, zeri	lê wey lê (a)
	Hey zeri, zeri, zeri	lo wey lo (b)
	Tu x'me de hêşya deri	(a,b)
	Tu b'zêran beranber i	(a,b)
	Mecidya çardeser i	(a,b)
	Em yek ın, zeri yek ın	(a,b)
	Bahçe w bûstan b'genek ın	(a,b)
	Keç hene law b'henek ın	(a,b)
	. . . . .	(I)
	Em d'do ne, zeri d'do ne	(a,b)
	Baxçe w bûstan b'gezo ne	(a,b)
	Keç hene law çi çé ne	(a,b)
	. . . . .	(I)
	Em s'sê ne, zeri s'sê ne	(a,b)
	Baxçe w bûstan b'hırmê ne	(a,b)
	. . . . .	(I)
	Em çar ın, zeri çar ın	(a,b)
	Baxçe w bûstan b'hınar ın	(a,b)
	Keç hene law çi har ın	(a,b)
	. . . . .	(I)
	Em pênc ın, zeri pênc ın	(a,b)
	Baxçe w bûstan bı sênc ın	(a,b)
	. . . . .	(I)

Em şeş in, zeri şeş in	a,b)
Baxçe w bûstan b'zebeş in	(a,b)
Keç hene law çî geş in	(a,b)
.....	(1)

## DİLÖK

(1)	Çing û çing, çin çing û çing	leylikê leylanê (a)
-I-	Çing û çing, çin çing û çing	evdalê canê (b)
	Lî hev ketin qaz û quling	(a)
	Lî hev qelîbin rom û fring	(b)
	Kerê bêriyê reş e	(a)
	Daşê bêriyê reş e	(b)
	Ser barê wi b'zebeş e	(a,b)
	Pira malê nexweş e	(a)
	Bûka malê keleş e	(b)
	..... (I)	
	Kerê bêriyê cûn e	(a)
	Daşê bêriyê cûn e	(b)
	Ser barê wi b'titûn e	(a,b)
	Pira malê melûn e	(a)
	Bûka malê xatûn e	(b)
	..... (I)	
	Kerê bêriyê spi ye	(a)
	Daşê bêriyê spi ye	(b)
	Ser barê wi b'hîri ye	(a,b)
	Pira malê mîri ye	(a)
	Bûka malê cîndi ye	(b)
	..... (1)	

### N Î Ş E (not) :

1. Dilok: stranên dawetê ne. Bî leystikên dilanê re û lî ser serê zava û bûkan tên strandin.
